Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1190 | 28-Tîrmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# 3 Jinên koçber bi hunera xwe hestên koçberiyê vedibêjin

Navenda Nûçeyan

**Sê jinên ku ji Efrîn û Serêkaniyê koçber bûne, li bajarê Dêrikê- Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, dijîn, bi hunera dest û dengê xwe xeyalên xwe pêk tînin û hestên xwe yê koçberiyê vedibêjin.**



Ji destpêka dagirkirina Efrîn û Serê Kaniyê ve, di sala 2018'an û 2019'an de gelê herêma Efrîn û Serê Kaniyê koçberî herêma Cizîrê bûn. Tevî ku di zorî û zehmetiyan de dijîn jî hê li ber xwe didin û xeyalên xwe pêk tînin. Li bajarê Dêrikê yê herêma Cizîrê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, sê jinên ku koçberên Efrîn û Serê Kaniyê ne derbarê karê xwe yê Benga Çandiniyê de, bi hunera dest û dengê xwe xeyalên xwe yê ku nîvco mabû pêk tînin.

**'Min bi îradeyê xwe îsbat kir'**

Rewşen Muhemed ji bajarê Serê Kaniyê ye, bi temenê xwe 24 salî ye li bajarê Dêrikê dijî, xeyalên xwe ya dengbêjiyê ya ku li bajarê Serê Kaniyê nîvco mabû li Dêrikê pêk tîne û karê dengbêjiyê dike. Rewşen Muhemed wiha behsa destpêka dengbêjî û armanca wê kir: "Ji zarokatiya xwe ve, ez ji karê hunerê hez dikim û dengbêjiyê dikim lê bi rengekî fermî ev nêzî 5 sal in min dest bi karê hunerê kiriye û dengbêjiyê dikim. Armanca min bi dengbêjiyê ew e ku ez hunera xwe biparêzim, da ku her dem nû bimîne û min dît ku dengbêjî derûniya min pir rehet dike min xwest her dem li ser dengbêjiyê kar bikim. Dema min dest bi hunerê kir ji aliyê malbata min ve gelek zehmetî hatin kişand. Ji ber ku hê jî ew zihniyeta desthilatdariyê heye, ji gotinên civakê ditirsiyan. Weke jineke Kurd min xwe îsbat kir û li hemberî hemû astengiyan sekinîm, min dest bi karê xwe kir."

**'Ez ê her dem dengbêjiyê bikim û hunera Kurdî biparêzim'**

Rewşen Muhemed wiha berdewam kir: "Ez hemû awayên stranên Kurdî dibêjim, ji ber ku ez Kurd im. Min stranên hunermendên Kurd ên bi nav û deng weke Eyşe Şan, Meryem Xan, Tehsîn Taha û Eyaz Yusif gotiye. Hunermendên ku ez zêde ji wan bi bandor bûm Şerîbana Kurdî û Eyşe Şan bûn û bi bandora wan ez gihîştim vê astê.
Li ser me jinên Kurd gelek binpêkirin hatin meşandin û her tişt ji me re şerm dihat dîtin. Ez dixwazim bibêjim ku helbestvan bi pênûsa xwe û hunermend bi dengê xwe hene. Ez jî weke dengbêjeke Kurd bi dengê xwe heme û ez ê her dem dengbêjiyê bikim heta ku hunera Kurdî biparêzim."

**'Çîrokên bajarê xwe bi riya wênexêziye vegot'**

Eyşa Hemo ku ji bajarê Efrînê ye, piştî ku Efrîn ji aliyê dewleta Tirk ve hat dagirkirin, berê xwe da bajarê Dêrikê û li wir dijî. Eyşa Hemo di ber karê xwe re wênexêziyê dike, behsa wêneyên xwe dike û dibêje: "Hê ez zarok bûm min wêne xêz dikir. Pir hestên xweş bi min re çêdibûn dema ku min wêne xêz dikirin. Min çîrokên bajarê xwe bi riya wênexêziyê vedigot lê ewqas derfet tunebû em xwe bi pêş bixin. Piştî ku min dest bi zanîngehê kir, beşa ku min dixwend endezyariya înşaetê bû, pir dûr bû ji wêneyên ku min xêz dikirin. Ji ber ku ez ji wêneyên portre hez dikim, weke xêzkirina rû yan jî tabloyên bêdeng. Armanca min ji wênexêziyê ew bû ku tişta di hundirê min de bi riya wênexêziyê derbixim."

**'Rûyê dayikên extiyar xêz kir'**

Eyşa Hemo zehmetiyên xwe û hestên ku jiyane wiha vegot: "Zehmetiyên ku ez dikşînim zextên civakê, malbat, madî û ya herî bi êş tu dûrî bajarê xwe yî. Lê ez bi îsrara xwe nahêlim ku tu bandorê li min bikin, her dema ku zextek ji aliyê tiştekî li min tê kirin ez wan hestên xwe bi riya wênexêziyê derdixim û tiştên pir xweş xêz dikim. Wêneyê ku min xêz kir û ez pir pê bandor bûm di dema şerê Efrînê de bû, min rûyê dayikên temenê wan mezin ê bi êş xêz kir, ez pir ji wan bi bandor bûm û hestên cuda bi min re çêbûn, ji ber pir çîrok digotin. Ez dixwazim di pêşerojê de odeyeke xêzkirinê ya taybet hebe, hemû wêneyên ku xêz dikim di wir de bi cih bikim û perwerdeyan ji zarokan re li dar bixim da ku wan fêrî wênexêziyê bikim. Di dawiyê de ez dixwazim çand û huner pêş bikeve"

**'Karên dest ji bo min pir bi qîmet e'**

Mejdûlîn Osman jî ji gundê Kefercenê yê girêdayî bajarê Efrînê ye, piştî dagirkirina Efrînê ew jî li bajarê Dêrikê bi cih dibe. Mejdûlîn Osman bi karê destên xwe tabloyên xweşik ku pê malan dixemilînin çêdike. Mejdûlîn wiha behsa hunera destên xwe dike: "Ji destpêka ku em li bajarê Dêrikê bi cih bûn ve min her dem dixwest maleke min a taybet hebe da ku ez bi tabloyên xwe bixemilînim."

**'Dara zeytûnê sembola bajarê min e'**

Mejdûlîn Osman behsa amûrên ku pê kar dike kir û wiha bi dawî kir: "Amûrên ku ez pê kar dikim silîkon, karton, şûşeyên vala yên cam, sinober, kîsên xêş, rengê depî û yên avî û pelên dara zaytûnê. Piraniya tabloyên min ên xwezayî ne tabloyên min ên yekemîn in, sempola bajarê min, dara zeytûnê ne. Min dixwest her dem Efrîn di bîra me de be. Ez dixwazim di pêşerojê de tiştên pir bi wate çêbikim da ku li hemû herêmê belav bibe û di her maleke Kurd de hebe bibe sembol. Ez ji her jinê re dibêjim dema ku tu di mal de bî wextê xwe vala derbas neke tiştên baş qezenc bike û bi hunera karên destên xwe destkeftiyên mezin ava bike."

# Klîpa bi navê 'Stranên Jiyanê' tê amadekirin



Navenda Nûçeyan

Desteya Çand û Hûnerê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk bi beşdariya hunermendên ji tevahî Sûriyeyê amadekariyên derxistina klîpekê dike. Di klîpê de stranên ji mîrasa gelê Ereb, Kurd, Suryan û Tirkmen hene. Nêzî 75 hunermendên jin û mêr, her wiha teknîsyen, berhemdêner û wênekêş klîpekê li ser çanda gelên li Sûriyeyê bi navê "Stranên Jiyanê" hazir dikin. Bi giştî 125 kes beşdar in. Ew klîp bi alîkariya Desteya Çand û Hunerê ya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk tê amadekirin.
Komeke hunermendên ji pêkhateyên Ereb û Kurd, şanoger, komek ciwanên di hunerê de li herêmên Rêveberiya Xweser dixebitin û studyoya Şehîd Welat çavdêriya derxistina klîpê dikin Derbarê berhema hunerî û dema weşandina wê de, endamê Tevgera Mezopotamya ya Çand û Huner û endamê Studyoya Şehîd Welat, Bêkes Darî got: "Ev berhem ji komeke stranên kurdî, erebî, suryanî û tirkmenî û bi zaravayên herêmên cuda yên Sûriyeyê di nav de Dera û Siweyda, zaravayên xelkê Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye. Ji 2 salan ve amadekariya wê tê kirin."
Li gorî Bêkes Darî, nêzî 75 hunermendên jin û mêr ji tevahî herêmên Sûriyeyê cih digirin.Berhem di 16'ê vê mehê de derbasî qonaxa kişandina dîmenan bû. Dê kişandina dîmenan 5 rojan bidome. Bêkes Darî têkildarî peyama kilîpê got: "Berhema me ji bo hemû gelan peyamek e ku em dikarin bêyî mezhebperestiyê yan jî kînê bi hev re bijîn. Aştiyê xurt bikin û tevna muzaîk a li Sûriyeyê nîşan bidin."
Girêdayî dîroka derketina klîpê Bêkes Darî anî ziman ku çaverê ye nêzî mehekê berhem bê weşandin.

Sudoku: Bersiv 97

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | 5 | 8 | 9 | 6 | 1 | 2 | 4 | 7 |
| 7 | 6 | 9 | 4 | 5 | 2 | 3 | 1 | 8 |
| 2 | 4 | 1 | 3 | 8 | 7 | 5 | 6 | 9 |
| 5 | 2 | 3 | 6 | 7 | 4 | 9 | 8 | 1 |
| 1 | 7 | 4 | 2 | 9 | 8 | 6 | 3 | 5 |
| 8 | 9 | 6 | 1 | 3 | 5 | 7 | 2 | 4 |
| 9 | 8 | 2 | 5 | 4 | 6 | 1 | 7 | 3 |
| 6 | 3 | 7 | 8 | 1 | 9 | 4 | 5 | 2 |
| 4 | 1 | 5 | 7 | 2 | 3 | 8 | 9 | 6 |

Sudoku:Pirs 98

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | | | 5 | |
| | 6 | | | | 1 | | | 9 |
| | 2 | 3 | 4 | 9 | | | 8 | 1 |
| | | 1 | 9 | | 6 | | | 2 |
| 8 | | | | | | | | 6 |
| 4 | | | 1 | | 2 | 7 | | |
| 4 | 6 | | | 1 | 3 | 2 | 7 | |
| 1 | | | 6 | | | | 9 | |
| | 3 | | | | | | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Kevir ji dêrê nakevin:**
- Tiştek nabe; tiştek naqewime.

**Li ser mezhebê Îmamê Çaroxî ye:**
- Li xêr û guneh nanêre; çi bikeve ber dike; tiştan zehmet nake.

**Ma merika me di ber de şkestiye?**
- Pereyên me lê neçûne; me ked di ber de nedaye; belaş bi destê me ketiye.

**Ma pehniya diya min pê xwîn bûye?**
- Bi heman wateyê.

**Ma dinya telekî bû?**
- Ma tiştek qewimî.

**Ma wê ker jê bikule:**
- Xem nake bila wisa be; zerera wê nîne; pir li ber nekeve.
(Dema yek pir li ber tiştekî dide û pir girîngiyê didiyê, ku ji bo yê din ne pir girîng be, hingê dibêje)

**Ma wê biçe dawetê:**
- Pêwîst nake tu wisa li ber bikevî, wisa bixemilînî.
(Dema yek pir li ber tiştekî dikeve, dixemilîne, xweşik dike hingê tê gotin)

**Ma xema kor e çira vemirî:**
- Çawa be tiştek bi wî nayê, ma wê çima xemê bixwe.

**Mezhebê wî fireh e:**
- Li xêr û guneh nanêre; çi bikeve ber dike; tiştan zehmet nake.

**Ne ji Hemzan e, ne ji Meman e, zirapê wan orta ne:**
- Ne kesekî wisa ye ku rêz jê re bê girtin; mirovekî bê êl û eşîr e.

**Pêça xwe nedayê:**
- Guhê xwe nedayê; li pey neket; girîngî nedayê; pêwîst nedît li dû bikeve.

**Pişta xwe dayê:**
- Guhê xwe nedayê; girîngî nedayê.
Qalibê kîrxwaran e/qalibê kîrxwehran e:
- Piştî ku karê hina xirab dibe nû ew tê bîra wan; karê kê xirab dibe bi wî dide rastkirin.

**Se direyî karwan diborî:**
- Ez gotinên wî girîng nabînim; tişta ji destê wî tê bila bike; ti qîmetê gotina wî nîne; ew çiqas bêje jî ezê weke xwe bikim; ji xwe re dibêje.

**Ser re borî:**
- Girîngî nedayê; baş çênekir.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Xwendinekî Piştî 101 Salan ji Lozanê re




Peymana Lozanê yek ji trajîdîya sadsalê ye, ku kurd sedsalî bi paş xistin, çawa ku bi Lozanê kurd di alîyê beden-cografî de hatin parçekirin, her wisa ji alîyê dil û mejî de jî hat parçekirin, di çand û ziman de jî hatin parçekirin, lewma jî îro hejmareke mezin ji kurdan bîyanîyê ziman.**R-3**

## 'Çareserî danûstendinên sûrî-sûrî ye'



Lihevkirina ku li ser hesabê rijandina xwîna gel û talankirina xaka Sûriyê pêk bê, wê tu carî xizmeta aramî û çareseriyê neke. Cîgirê Rêveberiya Xweser li Kantona Efrîn û Şehbayê Cemal Reşîd destnîşan kir ku çareserkirina aloziya Sûriyê tenê bi diyaloga Sûrî-Sûrî pêkan e.**R-5**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1190 | 28-Tîrmeh-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# HIŞMENDIYA DAIŞ'Ê RÛYÊ RAST Ê DAGIRKERIYA TIRK E

Di 27'ê Tîrmeha 2016'a teqîneke hovane taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo hejand. Di encamê de 62 kesan jiyana xwe ji dest dan û bi sedan birîndar bûn, her wiha ziyaneke pir mezin ya madî jî çûbû. Armanca çeteyên DAIŞ'ê û hêzên li pişt wan yên wekî dagirkeriya Tirk ji vê komkujiyê, têkbirina aramiya herêmê û şikandina vîna gel bû. Lê li hemberî wê hevgirêdana gelên herêmê xurtir bû, YPG û YPJ'ê herêm ji çeteyan rizgar kirin û destkeftiyên mezintir hatin bidestxistin.**R-4**





## 'Li dijî mêtingeriyê pêwîstî bi têkoşîna ekolojîk heye'

Ji Polen Ekolojiyê Cemîl Aksû got, têkoşîna li dijî mêtingeriyê divê têkoşîneke ekolojîk be û bal kişand ser erk û wezîfeya ji bo parastina xwezayê û çavkaniyan.**R-6**

## Li Rojhilata Navîn çand û şaristaniya kurdî



Çand û şaristaniya kurdî di pêşketina çandî û civakî ya Rojhilata Navîn de roleke girîng lîstiye. Kurd beşeke girîng a cihêrengiya dîrokî, erdnîgarî û çandî ya Rojhilata Navîn e û çanda wan bandoreke girîng li gelên din ên herêmê kiriye.**R-7**



## Ragihandina Jin... deng û azadiya jinê ye

Roj bi roj dezgehên raghandinê yên taybet bi jinan li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê gavên serkeftinê zêdetir dikin û pêş dikevin. Herwiha dewama serkeftinan, pêwîstî hîn zêdetir bi lêkolîn û bidestxistina zanyariyan heye.**R-2**



**Serkeftina komên biçûk**
Hafiz Ahmet Turhalli R-6



**Têkiliya bi dewletan re: Dîplomasi û xiyanet**
Ahmet Aktaş R-4

# Ragihandina Jin... deng û azadiya jinê ye

Roj bi roj dezgehên raghandinê yên taybet bi jinan li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê gavên serkeftinê zêdetir dikin û pêş dikevin. Herwiha dewama serkeftinan, pêwîstî hîn zêdetir bi lêkolîn û bidestxistina zanyariyan heye.

**Jîn Hisên/ Qamişlo**



Di rojnamegeriya kurdî de jina kurd gavên pir giring avêt, ji derxistina yekemîn rojnamegeriya kurdî bi navê 'Kurdistan' destpê kir. Roşen Bedirxan ji destpêka avakirina rojnameyê ve ku ji aliyê Miqdada Berdirxan ve hat damezrandin, beşdarî belavkirin û nivîsandinê bû.
Di sedsala derbasbûyî de raghandina azad karîbû dengê jinê di qada raghandin û rêxistinkirina civakê ji hêla fikrî û çandî de, bilind bike. Herwiha dikarîbo deng û xîtaba jinê li ser esas û bingehên azadî û demokrasiyê bilind bike û bibe alîkar ji bo bidestxistina nirxên azadî û avakirina pergala Netewa Demokrat a civakê.
Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi destpêkirina şoreşa 19`ê Tîrmehê re, bi riya vekirina dezgehên raghandinê yên mîna( Ajansa Hawar, Rojnameya Ronahî, Ronahî tv, Rojava tv û kovara Dengê Jiyanê), derfet ji jinê re hate dayîn da ku rola xwe bi awayekî çalak û pêşeng bilîze.
Wekî din ji berhemên jinan di şoreşê de dezgehên taybet bi dozên girêdayî jinan hatin damezirandin mîna (JIN TV, Radyo Star, Kovara Afaq Al mera û ajansa NÛJINHA).
Jin bi şansekî mezin tevlî vî warî bûn, nûçegihan, pêşkêşvan û adîtorên nûçeyan çêbûn, li gel jinên ku cihê xwe di karên îdarî de girtin di dezgehên raghandinê de jî, ev pêşketin gihaşt asta ku kenal û radyoyên herêmî yên taybet bi jin û dozên girêdayî wê, bi rêvebirina kadroyên jin bên avakirin.
Rola raghandina jinê di tevahî waran de û di têkoşîna jinê de pir giringe, di Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de gavên girîng hatin avêtin, li kêleka pêşengiya jinan di warê siyasî, leşkerî û civakî de, di aliyê raghandinê de jî pêşketinek balkêş pêk hat.

### Ji bo ragehandina rastiyê gelek jinên rojnamevan şehîd bûn

Ji bo gihandina rastiya şoreşê gelek jinên rojnamevan şehîd bûn û hin şehîdên jin yên rojnemevan wiha ne:
-Rojnamevan Agirî Yelmaz( Meryem Mihemed) di 13`ê Nîsana sala 2015`an de, di şopandina pêngava rizgarkirina Kobanê ji çeteyên DAIŞ'ê, şehîd bû.
-Arîn Cûdî ( Ahîn Îbrahîm) di sala 2016'an de, di encama teqîna mayînekê li Holê şehîd bû.
-Eylûl Nûhelat ( Ronahî Omer), di 2016'an de, dema şopandina pêngava rizgarkirina gundewarên Şehba de şehîd bû.
-Şîlan Botan ( Rîm Xişman) di 25'ê Nîsana 2017'an de, di bombebarana dagirekriya Tirk de li çiyayê Qereçoxê ya girêdayî bajarê Dêrikê de şehîd bû.
-Dilîşan Îbiş nûçegihana ajansa Hawarê di êrîşeke çeteyên DAIŞ`ê ya xwekujî di 2017`an de şehîd ket, Rohenda Efrîn di berxwedana Serdemê de li bajarê Cindirêsê sala 2018`an şehîd ket,
-Dilovan Gever( Dîlan Olmaz) di sala 2019'an de, dema şopandina êrîşên dagirkeriya Tirk li ser gundewarên Girê Spî de şehîd bû.
Mînakên jinên ku di qada ragihandinê de pêşengtî kirine gelek in, weke rewşenbîra şoreşger û rojnamevan Xurbet Elî Arsoz ku bû yekemîn rojnamegera jin ku li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê rêveberiya edîtoriya çapemeniyê kir û beriya 27 salan şehîd bû.
Herwiha rojnamevana kurd Deniz Firat di sala 2014'an de li Mexmûrê di êrîşên çeteyên DAIŞ`ê li ser Şengal û Mexmûrê şehîd bû.

### Yek ji berhemên şoreşê damezirandina YRJ'ê ye

Yek ji destkeftiyên jinan di şoreşa Rojava de, avabûna Yekîtiya Raghandina Jin (YRJ) di sala 2020 de bû, ku ji tevahî rojnamevanên jin û rêxistinkirina karên wan re bû sîwan.
Xebata bingehîn ya Yekîtiya Raghandina Jin Pradîgmaya Ekolojîk ya Demokratîk û Azadiya Jinê ye, armanca wê hişyarkirina civakê û avakirina kesayetek demokratîk û azad e, herwiha avakirina bingeheke xurt da ku tevahî kategoriyên civakê nêrînên xwe bînin ziman. Wekî din li dijî tevahî nêzîkatiyên zayendî ku jinê bişkîne disekine û domandina têkoşîna li dijî wê herwiha pêşxistina wekheviya zayendî di raghandinê de.
Di salên dawî de Yekitiya Ragihandina Jinê ji bo berfirehkirina nîqaşan bi rojnamvanên jin re li Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelek semîner organîz kir, herwiha nasîna karê ku dikeve ser milê wan û çawaniya karibin civakeke exlaqî-siyasî ava bikin.
Rojnamevana Jin tv Xedîce Îbrahîn Mîrza diyar kir ku bi şoreşa Rojava re di warê rojnamegeriya jin de gavên pir mezin hatin avêtin û wiha berdewamî da axaftina xwe: "Berî şoreşa Rojava asta rojnamegeriya jin pir kêmbû ji ber zihniyeta rêjîmê ku hatibû ferzkirin li ser civakê bi giştî, teqebûl tune bû ku jinek derkeve nêrînên gel bigre an di riya rojnamegeriyê civakê hişyar bike û rastiyan derxîne pêş, her tim zihniyeta baviksalarî serdest bû, rê nedidan her kesî ku di peymangeh an zanîngehên raghandinê bixweîne û dema mijar dibû kurd yek car rê nedihat dayîn.
Xedîca Îbrahîm Mîrza wiha pê de çû: "Şoreşa 19`ê Tîrmehê xwedî bingeh, fikir û armanc bû, pêwîstî hebû ku ev şoreş bê nivîsandin. Di riya pênûs û nivîsên jinan armanca şoreşê û fikra Netewa Demokratîk gihaşt civakê, destkeftiyên şoreşê hate nivîsandin û derket ji cîhanê re. Di şoreşê de hêzeke leşkerî ya jinan YPJ hate damezirandin, serkeftinên YPJ'ê hate nivîsandin di dîrokê de bi pênûsên jinan, jinê di tevahî warên jiyanê de û di saziyên civakî û îdarî de cihê xwe girt. Raghandina Jin jî hate avakirin bi armanca kar û xebatên jinan derxînin pêş."
Xedîce Ibrahîm Mîrza wiha domand: "Pêwistî hebû ku Yekîtiya Raghandina Jin were avakirin, di şoreşê de gelek dezgehên raghandinê hatin avakirin, jinê jî di nava van dezgehan de cihê xwe girt, xwe birêxistin kir û dezgehên taybet bi jinan avakirin."
Xedîce Ibrahîm Mîrza wiha da zanîn: " Rojnamevanên jin di destpêka şoreşê de pir astengî dîtin, li gel perwerdekirina xweserî xebat û kar dikirin da ku destkeftî û serkeftinên jinê di şoreşê de derxînin pêş. Gavên pir mezin hatin avêtin û bingehek hate avakirin heta dema heyî de bi saya şehîdên mîna şehîd( Deniz Firat, Nûjiyan Orhan, Xurbet Alî Arsûz) û hwd.. û em ê riya wan berdewam dikin weke rojnamevanên jin.
Li gorî rojnamevana JIN tv Xedîce Ibrahîm Mîrza di destpêka şoreşê hejmara rojnamevanên jin pir kêm bû, lê bi demê re rêjeya tevlîbûna jinê di qada raghandinê de gihşt nêzî ji sedî 75.
Xedîce Ibrahîm Mîrza wiha got: "Asta rojnamegeriya jin pir başbûye, roj bi roj gavên dezgehên jinan ên raghandinê zêdetir dibe ber bi pêşketinê, jinên rojnamevan di astên bilind kar û xebat dikin, perwerde tên dayîn li Akadîmiyan herwiha peymangeh hatin vekirin taybetî raghandinê. Ji bo ku xebat berdewam be bi serkeftinên din divê rojnamevanên jin zêdetir bixebitin û gavan bavêjin, hewilbidein adatên kevin ji holê rake û hişmendiya civakê bighurîne di nêrîna wan de derbarê jinê ev berpirsyartiyeke pir mezin dikeve ser milê rojnamevanan. Divê jinên rojnamevan dengê jinê bighîne tevahî cîhanê, civakê bi bi fikrê wekheviyê perwerde bike ji ber ku ew temsîla civakê bigiştî dikin."
Xedîce Ibrahîm Mîrza wiha anî ziman: "Civaka me bi salane desthilatdarî li ser hatiye meşandin, heta ew hişmendî bê guhertin kar û xebateke mezin jê re tê xwestin, divê rojnamevanên jin destkeftiyan zêdetir bidestbixin. Erkê rojnamevanên jin pir mezine, bi avakirina dezgeh û Yekîtiya Raghandina Jinan nayê wê wateyê ku em li cihê xwe bimînin, lê hîn divê em gavan bavêjin da ku pêşketin mezintir bidest bixin, destkefitiyên çêbûne wan binivîsînin, em bibin deng û rengê jinê di wê demê de em karin bêjin me gaveke avêtiye."
Xedîce Ibrahîm Mîrza di dawî de wiha anî ziman: "Kedek hatiye dayîn ji hêla şehîdan divê em xwedî li vê kedê derbikevin û berdewam bikin, ji xwe niha em di nava êrîşên dewleta Tirk dijîn, rojane topbaran heye em karibin bandoriya van êrîşan li ser jinê derxînin, van êrîşan bi ziman û rengê jinê şîrove bikin, dewleta Tirk û şaneyên razayî yên DAIŞ`ê şerê taybet ser civaka me dimeşîne divê weke rojnamevanên jin erkên xwe bi cih bînin, van şêwazên şerê taybet vala derxînin."

# Mîna sembola vegerê dareke zeytûnê li pêş mala xwe çand

**Her mirovek bi awayekî nirxên xwe yên ku pê bawer dike, diparêze. Çi bi rêya sembolên madî çi jî bi rêya yên manewî. Mirov bi vî awayî şopandina rêya rast a ku ji wan nirxan dernakeve, misoger dike.**

Di kolaneke taxa Eşrefiyê ya bajarê Helebê de ku hîn kavilan ji ser rûyê wê taxê bar nekirine, koçbera ji Efrîna dagirkirî ya bi navê Xalîde Hoto dareke zeytûnê li pêşiya mala xwe çandiye, da ku mafê vegera li Efrînê biparêze.
Xalîde (60) û malbata xwe ya ku ji 10 kesan pêk tê, cara yekê di 2012'an de di dema êrişên çeteyan li dijî taxa Eşrefiyê de, koçber bû. Cara duyê jî di 2018'an de dema Efrîn ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê hatiye dagirkirin bû.
Xalîde diyar kir ku zeytûn nasnameya Efrîniyan e û wê ew dar kiriye sembola misogeriya mafê vegerê, her wiha da ku gund û xaka xwe bîne bîra ferdên malbatê û neviyên xwe.
Piştî ku Xalîde ji Efrînê tê koçberkirin, ew berê xwe dide bajarê Kobanê, lê piştî 4 salan ew vedigere mala xwe ya wêranbûyî ya li taxa Eşrefiyê.
Dayika Xalîde bi alîkariya 2 zarokên xwe beşek ji mala xwe ji bo çandinî û şînkatiyê amade kiriye da ku bêhna xwe pê derxe û xwezaya Efrînê bîne bîra xwe.
Li aliyê rastê yê malê, dayika Xalîde gelek cûreyên sebzeyan çandine (firingî, xiyar, îsot..). Berhemên wê parçeya şînkatiyê pêdiviyên malê ji sebzeyan pêk tîne ku êdî hewcedariya dayika Xalîde bi çûyîna bazarê tune ye.
Dayika Xalîde sebzeyên zêde li cîranên xwe jî belav dike.
Di dawiya axaftina xwe de Xalîde diyar kir ku eger mala wê çend car din wêran bibe dîsa ew ê vegere mala xwe ya li bajarê Cindirêsê yê Efrînê û ava bike û ew ê girîngiyeke mezin bide baxçeya malê.
Di 18'ê Adara 2018'an de artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê piştî



topbarana giran li dijî sivîlan û piştî gelek komkujiyan û koçberkirina nêzî 300 hezar welatiyan, bajarê Efrînê dagir kir. **ANHA**



# Li Rojhilata Navîn çand û şaristaniya kurdî

Çand û şaristaniya kurdî di pêşketina çandî û civakî ya Rojhilata Navîn de roleke girîng lîstiye. Kurd beşeke girîng a cihêrengiya dîrokî, erdnîgarî û çandî ya Rojhilata Navîn e û çanda wan bandoreke girîng li gelên din ên herêmê kiriye. Wek beşeke Rojhilata Navîn, çand û şaristaniya kurdan dewlemendî û cihêrengiya herêmê zêdetir dewlemend dike. Çanda kurdî rengê Rojhilata Navîn e.

**Navenda Nûçeyan**



Em dikarin bandorên çand û şaristaniya kurdî li ser Rojhilata Navîn bi kurtî wiha binirxînin:
Huner û muzîk: Huner û muzîka kurdî beşeke girîng a çand û nasnameya kurdî ye. Huner û muzîka kurdî dîrok, çand û jiyana kurdan nîşan dide. Huner û mûzîka Kurdî di pêşketina çandî û civakî ya kurdan de li Rojhilata Navîn kedeke girîng daye.
Muzîka kevneşopî ya kurdî bi giştî cureyên wekî dengbêjî, stran û govend dihewîne. Dengbêjî di kurdî de tê wateya "şînî" û dengbêj gelek caran li ser mijarên wek evîn, cudabûn û şer helbest û stranên dirêj dibêjin. Stran bi kurdî tê wateya "stran" û kurte helbest û stran in ku bi gelemperî mijarên wekî evîn, xweza û jiyanê vedibêjin. Govend bi kurdî tê maneya "reqs" û bi gelemperî muzîka rîtmîk û herikbar e.
Muzîka nûjen a kurdî cureyên wekî pop, rock, caz û muzîka elektronîk dihewîne. Muzîka nûjen a kurdî bi giştî bi mijarên wekî nasnameya kurdî, dîroka kurdan û têkoşîna kurdan ve mijûl dibe.
Ziman: Kurdî yek ji zimanên herî zêde li Rojhilata Navîn tê axaftin e. Kurdî li gel erebî, tirkî û farisî yek ji çar zimanên sereke yên Rojhilata Navîn e. Zimanê kurdî yek ji kevintirîn zimanên cîhanê ye û dîroka wê nêzî 2500 sal e. Îro bi zimanê Kurdî bi qasî 40 milyon kesî diaxivin. Kurdî di pêşketina çandî û civakî ya Rojhilata Navîn de amûrek girîng e. Kurdî di Wîkîferhengê de di rêza 8'emîn a herî dewlemend a cîhanê de cih digire. Li gorî daneyên Wîkîferhengê di kurdî de 918.123 peyv hene. Bi vê yekê zimanê kurdî li pêş zimanên wekî Îngilîzî, Frensî, Malagasî, Çînî, Rûsî, Yewnanî û Almanî dixe. Kurdî di pêşketina çandî û civakî ya Rojhilata Navîn de roleke girîng dilîze.
Wêje: Wêjeya kurdî yek ji dewlemendtirîn kevneşopiyên edebî yên Rojhilata Navîn e. Di wêjeya kurdî de berhemên curbecur ên wekî helbest, roman, çîrok û gotar hene. Wêjeya kurdî pêşketina çandî û civakî ya Rojhilata Navîn nîşan dide. Çend mînakên girîng ên wêjeya kurdî ev in: Di wêjeya kurdî ya klasîk de berhemên ku di serdema sedsala 13'an heta sedsala 19'an de hatine nivîsandin hene. Çend berhemên girîng ên ku di vê serdemê de hatine nivîsandin ev in:
Mem û Zîn (1692) – Ehmedê Xanî: Mem û Zîn, yek ji girîngtirîn berhemên wêjeya kurdî ye, çîroka trajîk a du ciwanên evîndar vedibêje.
Dîwana Feqiyê Teyran (sedsala 16'an) – Feqiyê Teyran: Dîwaneke ku helbestên Feqiyê Teyran, yek ji helbestvanên herî girîng ên wêjeya kurdî yên xezalan tê de hene.
Dîwan (sedsala 16'an) – Melayê Cizîrî: Dîwaneke ku helbestên Melayê Cizîrî, ku yek ji dîwanên herî girîng ê edebiyata kurdî ye, tê de ye.
Ol û feylesofî: Kurd yek ji kevintirîn û kûrtirîn şaristaniyên Rojhilata Navîn in. Di pêşketina olî û feylesofiya Rojhilata Navîn de çanda kurdî roleke girîng lîstiye. Di belavbûna îslamê de kurdan roleke girîng lîstin.
Piraniya kurdan misilman in. Ruhaniyên Kurd çend ji rewşenbîrên girîng ên cîhana îslamê ne. Lê hinek kurd jî hene ku ne misilman in. Mînak êzidîtî oleke tenê ya kurdan e. Pirtûkên wan ên pîroz "Mishef-a Reş" û "Kitâbu'l-Cilve" bi kurdî hatine nivîsandin. Hemû îbadetên baweriya êzidiyan bi kurdî tê kirin. Êzidîtî yek ji olên herî taybet û dewlemend ên Rojhilata Navîn e. Êzidî bi bawerî, çand û şêwaza jiyana xwe dewlemendî û cihêrengiya Rojhilata Navîn dewlemendtir dikin. Êzidî di dîrokê de rastî zilm û zordariyê hatine. Lê belê êzidiyan parastina bawerî û çanda xwe berdewam kirin. Îro nêzîkî milyonek peyrewên êzidîtiyê hene û li herêmên kurdî yên Iraq, Sûriye, Tirkiye û Îranê dijîn. Êzidîtî yek ji olên herî taybet û dewlemend ên Rojhilata Navîn e. Êzidîtî bi bawerî, çand û şêwaza jiyana xwe dewlemendî û cihêrengiya Rojhilata Navîn dewlemendtir dike.
Koka feylesofiya kurdî di olên wek Zerdeştî û Îslamiyetê de ye. Feylesofên kurd ji aliyê feylesofî ve li prensîb û hînkirinên van olan lêkolîn kirine. Feylesofiya kurdî yek ji feylesofiyên herî resen û dewlemend ên Rojhilata Navîn e. Feylesofiya kurdî dîrok, çand û jiyana kurdan nîşan dide. Feylesofiya kurdî di pêşketina çandî û civakî ya kurdan de li Rojhilata Navîn kedeke girîng daye.
Hin fîlozofên ku di pêşketina feylesofiya kurdî de rolek girîng lîstine ev in:
Mansur ê Hellac (858-922): Ew sofî û helbestvanekî kurd e, li Bexdayê jiyaye. Hellac di feylesofiya sûfîzmê de xwedî cihekî girîng e û bi gotina xwe ya "enel heq (Ez rastî me)" navdar e. Piştî darvekirina Hellac, ramanên wî li Rojhilata Navîn belav bûn. Fikrên Mansur ê Hellac ji aliyê sofiyên girîng ên wekî Mewlana Celaleddîn Rûmî, Yunus Emre û Hacî Bektaş Velî ve hatine pejirandin.
Şemseddîn Şehrezûrî (1181-1258): Şemseddîn Şehrezûrî, yek ji girîngtirîn feylesofên kurdan, nûnerê girîng ê feylesofiya îslamê ye. Şemseddîn Şehrezûrî hewl daye ku di feylesofiya xwe de aqil û wehyê bi hev re bi kar bîne.
Seyfeddîn Amîdî (1160-1233): Yek ji girîngtirîn oldarên kurdan, nûnerê girîng ê feylesofiya îslamê ye. Amîdî di feylesofiya xwe de li ser esasên bingehîn ên îslamê ji aliyê feylesofî ve lêkolîn kiriye.
Mele Xelîl Sîrdî (1754-1848): Yek ji girîngtirîn alimên olî yên kurdan, nûnerê girîng ê feylesofiya îslamê ye. Sîrdî di feylesofiya xwe de li ser esasên bingehîn ên îslamê ji aliyê feylesofî ve lêkolîn kiriye.
Ehmedê Xanî (1650-1707): Yek ji helbestvan û nivîskarên herî girîng ê kurdan e, di heman demê de feylesof e. Ehmedê Xanî di feylesofiya xwe de hêmanên çand û dîroka kurdî nirxandiye.
Şêrko Bêkes (1940-2013): Yek ji helbestvanên herî girîng ê kurdan e, di heman demê de feylesof e. Bêkes di feylesofiya xwe de behsa bingehên nasname û hebûna kurdî kiriye.
Cil, berg û şêwaza jiyanê: Çanda kurdî bandor li cil, berg û şêwaza jiyana Rojhilata Navîn jî kiriye. Şêweya cil û bergên kurdî yek ji şêwazên cil û bergên herî taybet e, û bi taybetî yên Rojhilata Navîn e û şêwaza jiyana kurdî jî yek ji şêwazên jiyana herî dewlemend û cihêreng a Rojhilata Navîn e.
Çand û şaristaniya kurdî di pêşketina çandî û civakî ya Rojhilata Navîn de roleke girîng dilîze. Wek beşeke Rojhilata Navîn, çand û şaristaniya kurdan dewlemendî û cihêrengiya herêmê zêdetir dewlemend dike.

# Şoreşgerê bi çek û tembûra xwe têkoşiyayî: Hozan Serhed

**Navenda Nûçeyan**



Tevgera Azadiya Kurdistanê ne tenê di warê leşkerî de şoreş pêkanî, her wiha di warê çand û hunerê de jî, bingehek sexlem ava kir û bilind kir. Yek ji wan berên bingehîn jî Hozan Serhade. Bi ser şehadeta Hozan Serhad re 25 sal derbas dibe, lê Hozan Serhed hê jî dengê zindî yê her çar parçeyên Kurdistanê ye.
Hozan Serhad (Sileyman Alpdoxan) di 24'ê Tîrmeha 1970'an de li navçeya Zêtka (Elajgir) a Agiriyê ji dayik bûye. Ji malbatekê du xwişk û sê birayan pêktê û zarokê malê yê herî biçûke. Hozan Serhad zaroktî û ciwantiya xwe li Patnosê derbaz dike. Heta dibistana navîn li wê derê dixwîne. Hîn di heftsaliya xwe de bala wî diçe ser tembûrê. Di temenê zarokatiyê de ji birayê xwe yê mezin bandor dibe û dest bi jenîna tembûrê dike.
Di sala 1988'an de di nava hezar û 800 xwendekarên Zanîngeha Îzmîrê de di beşa muzikê de dibe duyemîn. Li wir li şûna tembûrê, dest bi xwendina tar a ji muzika Azerî dike. Piştre jî hêdî hêdî fêrî piyano, gîtar û bilûrê dibe. Di demên ciwantiya wî de, pêlên tevgera azadiya gelê Kurd bi awayekî xurt berfireh dibe. Di heman demê de jî pêngavek siyasî derbasî pêvajoya şerê çekdarî dibe. Li hemberî vê têkoşîna gelê Kurd, şerê taybet yê dewleta Tirk jî dest bi taktîkê nû dike. Qirkirinên xwe yên li ser gelê Kurd zêdetir dike. Di encama vê polîtîkaya desthilatdariya dewleta Tirk de, rêjeya têkoşerên gelê Kurd roj bi roj zêdetir dibe. Bi vî awayî bala ciwanan ber bi hestên têkoşîna welatparêzî ve diherike.
Di vê pêvajoyê de Hozan Serhad hem dixwîne hem jî li ser hunerê dixebite. Ji xwendinê zêdetir bala xwe dide ser hunerê. Di sala 1988'an de tevlî ezmûna konservatuwarê dewletê ya Zanîngeha Egeyê beşa mûzîkê dibe û qezenç dike. Salên konservatuwarê ji bo wî dibin salên li xwe vegerîn û lêpirsînê. Li wir giringiyê dide nîqaşên li ser rastiya Kurdistanê, divê huner û hunermendek rast çawa be.
Li zangîngehê bi girîngî qala muzik û stranên Kurdî dike. Dest bi lêkolînan dike. Her wiha çend stranên Kurdî dubare zindî dike.
Hozan Serhed di sala 1991'an de li gel xwendekara bi navê Yildiz dizewice û Tîrmeha heman salê de bi hev re beşdarî nava refên gerîla dibin. Yildiz piştî demekê ji aliyê hêzên dewleta Tirk ve tê girtin û dibin girtîgeha Emasya. 12 sal ceza lê tê birîn.
Piştî vê bûyerê Serhed berê xwe dide Şamê û destpêkê diçe herêma Heftenînê û piştre jî Akademîya Mahsum Korkmaz perwerdeyê dibîne. Ji ber jêhatiya wî ya derbarê muzikê derbazî Hunerkomê dibe, li Ewropa karê hunerî dike. Di nava koma Berxwedan de cih digire. Girîngiyê dide hunera resen û zindîkirina wê.
Hozan Serhed di sala 1996'an de ji Ewropa vedigerî Kurdistanê û piştî çend mehan li Zapê dimîne, tê Başûrê Kurdistanê û li Navenda Rewşenbîrî ya Mezopotamya ya li Hewlêrê dimîne. Piştre jî li Silêmaniyê karê xwe berdewam dike. Li hemû deverên Başûrê Kurdistanê xebatên mûzîka şoreşgerî pêştêxe. Bi taybet li wargeha Etruş ya Şehîd Jiyan hem xebatên mûzîkê pêşxistiye hem jî di dibistanên wargehê de mamsotatiya waneya muzîkê kiriye.
Piştî ku di 17'ê Gulana 1997'an de hêzên PDK'ê êrişî Navenda Rewşenbîrî ya Mezopotamya ya li Hewlêrê û mala birîndaran kirin û hinek hevalên wî yên hunermend û bi dehan, welatparêz, rojnameger û gerîlayên birîndar şehîd bûn, Hozan Serhed strana bi navê 'Hewlêr' tomar kir. Vê stranê Hozan Serhed li Başûrê Kurdistanê ewqas din da naskirin.
Hozan Serhed di salal 1999'an de beşdarî Komcivîna şeşemîn a PKK'ê dibe. Ew di komcivînê de ji bo karên muzîkê yên Ewrupayê tê erkdarkirin. Lê ji ber girtina Rêber Ocalan ya di encama Komployek Navneteweyî de ev erka wî pêknayê. Di komcivînê de her wiha biryar tê girtin ku koma Hisên Kaytan wênegir û derhêner Xelîl Uysal herin herêma Botanê. Hozan Serhed jî ji bo kişandina klîban dixwaze bi wan re here. Bi hev re derbazî herêma Botanê dibin.
Hozan Serhed 22'ê Tîrmeha sala 1999'an dema ji bo tomarkirina kilîbek li gel çend gerîlayek din berê xwe dide herêma Botanê, dikeve kemîna leşkerên Tirk û şehîd dikeve.
Tevî 25 sal bi ser şehadeta hozan Serhed re derbaz bûye, dengê wî hê jî di nava her çar parçeyên Kurdistanê de zindî maye.
Hinek berhemên Hoza Serhed evin: Ez Kurdistanim, Hewlêr, Payîze, Çuka Serê Darê, Mizgîna Leheng, Deşta Heyatê, Gerîla Rojbaş, Sîpanê Xelatê, Beyadî, Agrinin Îsyan Kizi, Dayê Dayê…

# Teqîna Taxa Xerbî...Êşa nayê jibîrkirin

Di 27’ê Tîrmeha 2016’an de, çeteyên DAIŞ’ê bi riya kamyoneke tijî teqemenî êrişeke hovane li Txax Xerbî ya bajarê Qamişlo pêk anî. Di encama teqînê de 62 kes şehîd bûn û 176 kes jî birîndar bûn. Tevî derbasbûna 8 salan di ser vê teqînî re, lê hîn jî ew kêlî di bîra malbatên qurbaniyan de zindî ye.

**Lîloz Hisên/ Qamişlo**


Di 27`ê Tîrmeha sala 2016`an, çeteyeke xwekuj yê DAIŞ`ê bi riya kamyona ku tê de 18 ton teqemîn hebû, derbasî navenda bajarê Qamişlo bibû û li taxa Xerbî xwe teqand. Di encamê de bi dehan welatiyên bajarê Qamişlo şehîd û birîndar bûn, herwiha zirar gihaşt mal, milk û dikanên welatiyan.

Piştî derbasbûna 8 salan di ser teqîna Taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo re, hîn jî hûrgûliyên wê kêliya teqînê ya bi êş di bîra şêniyan de ye.

Her sal malbatên qurbaniyan di 27`ê Tîrmehê de li cihê teqînê kom dibin ji bo zarokên xwe bibîr bînin, wêneyên wan hildidin û mûman vêdixin.

Di 1`ê Çilya sala 2018`an, Hêzên Sûriya Demokratîk bi daxuyaniyekê ragehand ku hêzên wan bi riya operasyoneke taybet li Dêrazorê berpirsê teqîna Taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo kir hedef û di encamê de ew serçete hat kuştin.

Hêjayî bibîranînê ye ku di encama teqîna hovane ya Taxa Xerbî de 62 welatî şehîd bûn, 176 welatî birîndar bûn û bi 10’an dikan û avahî hilweşiyan, herwiha bi 100’an avahiyên nêzî cihê teqînê zerar dîtin. Tişta herî bi êş ew e



ku qurbaniyên teqînê li pey xwe zarokên sêwî, hevjîn, dayik û malbat hiştin.

Jina bi navê Cîhan Dawid dayika zarokekî ye ku hevjînê wê Mihemed Osê di teqîna taxa Xerbî de jiyan xwe ji dest da wiha behsa bûyerê dike: “Hevjînê min karê Mobîliya dikir û herdem di seat 10’ê sibehê de diçû ser karê xwe. Lê di roja teqînê de, ji bo temamkirina odeya ciwanekî ku hazirtiya zavatiyê dikr, wê rojê zû çû ser kar. Piştî teqîn pêk hat, hevjînê min û ciwanê ku hazirtiya zavatiyê dikr û zarokek di qeboyê de asê man, piştî teqînê bi seetekê ji ber dûmanê jiyanan xwe ji dest dan.

Cîhan Dawid axaftina xwe wiha qedand: “Ez û hevjînê xwe pir



kêfxweşbûn di jiyana xwe de. wî di wê rojê de pir lez dikir û dixwest biçe ser karê xwe, lê wê teqîna hovane êşeke giran bi ser min de anî, tu carî kêliyên wê rojê ji bîr nabin, li ser bîranînan ez jiyan dikin. Her sal em li cihê teqînê tevlî salvegerê dibin, her sal jî birîn nû dibe.”

Wê sibehê bêdengiyek hebû li gel deng û awazê çivîkan li asîmanê bajarê Qamişlo, lê vê yekê pir dirêj nekir, beriya 8 salan bi bûyerek bi êş ku nayê jibîr kirin em ji xwe rabûn; bi van gotinan hevjîna şehîd Atî Mûsa ku di teqînê de şehîd bûbû, Şêxa Mihemed Elî behsa hurgûliyên wê rojê dike û wiha domand: “Hevjînê min li dibistana Mûsa Bin Nûseyr kar dikir, dema diçû gel hevalekî xwe li cihê bûyerê şehîd bû, me nizanîbû ew li cihê teqînê ye, lê piştî seatek di ser teqînê re derbas bû, xebera wî ji me re hat ku dema ew rakirin nexweşxaneyê, di rê de jiyanan xwe ji dest da.



# ‘Li dijî mêtingeriyê pêwîstî bi têkoşîna ekolojîk heye’

**Ji Polen Ekolojiyê Cemîl Aksû got, têkoşîna li dijî mêtingeriyê divê têkoşîneke ekolojîk be û bal kişand ser erk û wezîfeya ji bo parastina xwezayê û çavkaniyan.**

Ji Polen Ekolojiyê Cemîl Aksû ji ANF’ê re axivî û anî ziman ku sedsala Tirkiyeyê veguheriye rejîmeke rewşa awarte û ev yek jî bi taybetî ji sala 2015’an û vir ve ketiye meriyetê. Cemîl Aksû got, “Serwer li gorî destûra bingehîn û qanûnên xwe jî tevnagerin. Qanûndanîn, rêveberî, dadgerî hemû li Qesrê ne. Lêgerîna li maf, lêgerîna li edaletê, grev, çalakî bi tundî têne tepisandin. Ev rejîma rewşa awarte li gel êrişa li ser tevgerên muxalefeta civakî her wiha êriş bir ser berxwedana hawirdorê ya herêmî.”

Aksû ragihand ku li Tirkiye û Kurdistanê şîrket ji bo çiya, daristan, çem, qadên çandiniyê tarûmar bikin seferber bûne û anî ziman ku ji ber qezenca şîrketan karker li ser kar û ji ber nexweşiyên pîşeyî jiyana xwe ji dest didin.

**Hiqûqa mêtingeriyê heye**

Aksû diyar kir ku li Kurdistanê hiqûqa mêtingeriyê heye; polîtîkayeke du alî ya hilweşandinê tê meşandin û got, “Kurdistan di statuya mêtingeriyê de ye, li ser vê jî hebûna neteweyî ya Kurd tê înkarkirin, têkoşîna azadî û wekheviyê tê tepisandin. Ya duyemîn jî sermaye di asta navneteweyî de bi rola xwe radibe û li gorî vê jî polîtîkaya aboriyê dimeşîne. Ji ber faktora destpêkê cografya Kurdistanê salên dûr û dirêj bi polîtîkayên koçberiya siyasî û aboriyê re rû bi rû hate hiştin. Bi GAP û bendavan di bin navê ‘razemeniyê’ û ‘bendavên ewlekariyê’ de ked û hêza xwezayî ya herêmê pêşkêşî sermayeyê hate kirin. Ji ber van herdu polîtîkayên hilweşînê hem xwestin neteweya Kurd parçe bikin hem jî bi parçekirinê re gel weke hêza erzan a kedê li pîşesaziyên bajaran, li sektora xizmetê weke karker bi kar bînin. Ev yek ne tenê şîroveyeke, qelemşorên xulamê sermayeyê ev yek anîn ziman.”





**Tu bi parastina xwezayê berpirsyar e**

Aksû got, mêtingerî sîstemeke welê ye ku hem xakê bi xwînxwarî talan dike, hem jî tundiyeke hovane li hemû zindiyên li ser xakê dike û wiha dewam kir, “Me bi gelek şêweyan dît. Li Kurdistanê di asteke gelekî cidî de pirsgirêka ziwatiyê heye. Li xaka berhemdar a tejaneya Dîcleyê êdî garisên GDO yên Bayerê têne çandin. Li quntarên Cûdî daristan têne birîn. Her havînê ji ber ‘ewlekariyê’ daristanên ji darê berû têne hilweşandin. Şîrket bêyî ku guh bidin mewzûatên qanûnî bi her awayî kar dike. Li çiraxa Çemê Mûratê ku baskekî Çemê Firatê ye, ji bo madenkariya zêr a bi siyanur a mîna Îlîçê şîret û dewlet bi hev re kar dikin. Tejaneya Çemên Dîcle û Firatê ji ber madenkarî, bermahiyên bajaran, çandiniya endustriyê veguherîne qadeke eko qirkirinê. Ji ber vê yekê jî têkoşîna li dijî mêtingeriyê divê têkoşîneke ekolojîk be. Eger mêtinger dixwazin xaka te bêkêr bike, hingî wezîfeya te ye ku tu daristan, çem, qadên çandiniyê biparêze.”

## Serkeftina komên biçûk



Hafiz Ahmet Turhalli

Wek hun xwendevanê hêja jî dizanin, bi taybet Netewa Kurd, weke komekî biçuk dest bi şoreşa Kurd û Kurdîstanê kir. Kesayetên xwedan vîn û berxwedêr, li beramber hêzên mezin, cesaretekî bê sînor li xwe pêçandin û dest bi berxwedanek pîroz kirin. Dewleta Tirk û hevkarên wan bi hêzên xweyên leşkerî, aborî û têkiliyên bingehîn yên sîyasî jî, nikaribun bizava Kurd têk bibin.

Ev koma han weke çîroka Talut û Calut ku, di Quran‘a pîrozde jibo şîret girtinê hatiye gotine.

Qur’an Jibo Pêxember û hevalên wî di tekoşînê de bêbawerî û bêîrade neminin vê çîroka han, ji Pêxemberê me Hz Muhemmed (sas) be dibêje. Çîrok di Sureya Beqerde derbas dibe:

Talut dema bu fermandar ji leşkerê xwe re wisa axifî got:

‘Ewê Xweda we bi çemekî biceribîne (îmtîhan bike). Kê jiwe, jivê Çemê (avê) vexwe, ew ne jimeye. Kê ji avê tam neke (venexwe) û Çengekî avê liba xwe bigre, ew jimeye.“ Henekî ne têde, hemuyan jiwê avê vexwarin. Ew û bawermendên pêre dema ji Çem derbas bun, yên ji hevaltiya (Talut) ketin weha gotin: „Îro tu hêza meya kû em li beramber Calut bisekinin û biserkevin nemaye. “Kesên bawerdikir kû wê leqa Xwedayê xwe werin weha gotin: Gellekî komên hijmarên wanan kêm û biçuk, bi îzna Xwedê li beramber komên mezin serkeftin bidest xistine.“ Xweda bi kesên berxwedêr reye.’ (Beqere 249)

Belê ev koma kû Qur’an pênase dike çîrokekî ku di kurahiya şer û tekoşînên heqî û neheqiyede çêbune radixe berçavên me. Di Dîroka Mirovahiyêde gellekî Împarator û Siltan hebune, xwedan hêz û leşker bune, rexmî vêna li beramber Pêxember û Rêberên rast û hevalên wan têkçune.

Dema vê dozê li bakurê Kurdîstanê dest bi karê xwe kir, gelê Kurd kû hatibu çewsandin weha digot; ev koma feqîr û belangaz ewê li beramber vê dewleta xwedan hêz çi bike! Hun bi van dewletan nikarin, ji dewletan re dewlet lazime.

Lê Dema serokê gelê Kurd dest bi bizava xwe kir, wîjî got ev çemekiye navê wî Kurdîstane. Dagirkeran welatê me dagir kirine û divê ev welat were rizgarkirin. Got: lê emê birçî bimînin, tazî bimînin, werin şehîd kirin, bikevin zîndanan, divê hun ji destê Neyaran avê venexun. Ger hun wê avê vexun, hun nejimene! Kesên qaşo doza Kurdîstanê dikir, ava neyaran vedixwar, nanê wan dixwar û digotin em doza Kurdîstanê dimeşînin. Ew Rêxistin û kesayetên ku, av û nanê dujmin xwar û vexwarin zeîf ketin û têkşikestin. Kesê ava Tirkan xwarin weha bang kirin: hawar ev dewlet bi hêzê û em biwan nikarin. Lê Qehreman û Egîdên ku ji ava Neyaran venexwarin, berxwedan û tekoşîn mezin kirin. Îrojî ev Egîdana di tunêlên şerde li bin erdê, li beramber kîmyasalan ber xwe didin. Desthilatdarên Başur ku ev 40 sale azadin, hêza wanjî heye, weha gelê xwe dixapînin, dibêjin me hêz nîne, em bi Tirkan nikarin. Weke Çîroka Calut û Talutjî, Tekoşerên ku îro di tunêlên şerde berxwe didin, weke leşkerên Talut biserdikevin. Kesê av û nanê neyaran dixun di ruhde têk çune. Her serkeftin wê para kesên berxwedêr be. Rexmî hemu zehmetiyan serkefin nêzîke.



# Xwendinekî Piştî 101 Salan ji Lozanê re

Tê zanîn Şerê Cîhanê yê 1’emîn zemînê Peymana Syks Pico danî û herêma Rojhilata Navîn parçe kir, bi Peymana Firshay welatên di şer bi serketî Rojhilata Navîn li gor berjewendîyên xwe herêm li xwe parvekirin, bi dehan dewlet û dewletokên qaşo serbixwe yên xizmeta berjewendîyên dewletên di Şerê Cîhanê yê 1’emîn de serketî hatin avakirin, bi navê tirkan û ereban dewletên weke Tirkîye, Sûrîye û Îraq li ser axa dîrokî ya kurdan hatin avakirin û bi ti awayî gelê kurd ê ku bi hezarê salan li ser vê axê jîyan dike li ber çavan negirtin. Peymana Lozanê (1923) ya kurd înkar kirin; yek ji encamên li hevkirinên hêzên navnetewî ye û di pileya yekemîn de ji doza kurd ew berpirsyar in, dewletneteweyên bi destê hêzên derve li herêmê hatin avakirin gel û civakên herêmê bi hev dan kuştin û herêmê kirin gola xwînê, û krîz kûrtir kir.

Peymana Lozanê yek ji trajîdîya sadsalê ye, ku kurd sedsalî bi paş xistin, çawa ku bi Lozanê kurd di alîyê beden-cografî de hatin parçekirin, her wisa ji alîyê dil û mejî de jî hat parçekirin, di çand û ziman de jî hatin parçekirin, lewma jî îro hejmareke mezin ji kurdan bîyanîyê ziman, çand û nasnameya xwe bûye, bi mîlyonan kurd di nava destarê asîmlasonê de hatin hêran bûn tirk, ereb û faris. Beşekî kurdan ji kurdînîya bav û bapîrên xwe direvîya, ji cil û bergên xwe şerm dikir, heyranî, tirkbûn, erebûn û farisbûn bûye. Gelo li kîjan devera dunyayê neteweyek du alfabayan hemwext bi kar tîne? Ev bîyanîbûna di beşekî kurdan de pêş ketîye, bi vê mijarê ve girêdayî sosyologê Tunisî ``Ibin Xeldûn`` dibêje: ``kesên binketî her dem di droşm, cil û berg, bawerî, hemû rewş û karên xwe de, hez dikin li ser şopa yê ew bin xistîye tevbigere û taqlîdî wî bike``. Di nava kurdan de ji vî cûrê mirovan pir in, ji cewher û rastîya xwe derketine, bi wê tenê jî nakin ji wê zêdetir pêde diçin û beşek ji wan ketine xeta xîyanetê li kêlek dijmin li dijî gelê xwe di nava tevgerê ye, gotineke heye di nava civaka kurd tê gotin ``kurd kewê gozel e, dixwîne qewmê xwe dixe dafikê``. Lozanê kurd bê maf û bê nasname hiştin, kurd bê statyû hiştin, kurd rûbirûyî polîtîkayên jinavbirina fizîkî, asîmlasyon, û koçberkirina bi darê zorê kirin. Eger em giştî Kurdistan di asta çar parçeyan de bigirin dest em ê bêjin zêdeyî mîlyonek kurd piştî şerê Cîhanê û Peymana Lozanê bûye qurbanî, bi zêdeyî bi dehan mîlyon kurd ji cih û warên xwe koçber bûne, bi deh hezaran gund hatine şewitandin.

Di nava sed û yek salî de li çar parçeyên Kurdistanê çi bi serê kurdan hat? Gelo di nava sed û yek sal piştî Lozanê di rewşa Cîhanê, herêmê de çi guherîye? Çi guhartin di rewşa kurdan ya sîyasî û leşkerî de çêbûye. Gelo kurd di sedsala 21. De dê mafê xwe bistînin? An sedsal din kurd ê di bindestê van çar dagirkerên kurdistanê bimînin? Lozan ê çawa




bê derbaskirin?

Piştî avabûna Komara Tirkîye doza kurd hat mandelkirin, polîtîkayên qirkirin, asîmlasyon û koçberkirinê li çar parçeyên Kurdistanê dest pê kir, plana Îslahata Şerq li Bakurê Kurdistanê dest pê kir, li Rojavayê kurdan bi serhejmartina 1961 re nasname ji kurdan hat kişandin, kembera erebî ket merîyetê, li Îraqê qonaxên enfal û kîmyabaranê yek li pey yek dest pê kir. Di dema şerê Cîhanê û piştî Peymana Lozanê di nava 100 salî li giştî Kurdistanê zêdedeyî mîlyonek kurd bûne qurbanîyê vê peymanê, zêdeyî 10 hezar gund hatine şewitandin û rûxandin, zêdedeyî 10 mîlyon kurd ji koçber bûne, bi kêmanî 10 mîlyon kurd asîmle bûne. Dewleta Tirk roleke sereke di danîna tewrî, proje û planên tunekirina kurdan de leyîstîye, Plana Îslahata Şerqê cara yekemîn di sala 1925 ji alîyê Tirîyê ve ket merîyetê. Di nava her çar dagirkerên kurdistanê de hemahengîyeke xurt ya ewlekarî û istîxbaratî bi dirêjîya 100 berdewam e, Peymana Sad Abad ya sala 1937 di navbera Tirkiye Îran, Îraq û Afganistanê ya bi serpereştîya Brîtanya her çendî di şikil de li dijî Rûsya bû, di heman demê dijî kurd bû jî, dîsa Peymana 1932 ya navbera Tirkîyê û Îranê derbarê têkbirina serhildana Araratê, ku Îranê rê da Tirkîyê ku derbasî nava axa wê bibe ji paş ve li servanên kurd bizivire û wan tune bike, di sala 1963 de jî artêşa Sûrîyê(Lîwai El Yermûk) di pêşengtîya Fehd El Şair çû hawara Ba`asîyan bi artêşa Îraqê re bû alîkar li dijî tevgera kurd, di sala 1982’an de li dijî Partiya Karkên Kurdistanê Peymanek di navbera Îraq û Tirkîye hat çêkirin ku rê dide hêzên Tirkîyê ku 5 km axa wê derbas bike, di 1998 jî Peymana Edenê di navbera Sûrîye û Tirkîyê çêbû, rê ji Tirkîyê re tê dan ku axa Sûrîye derbas bike û tevgera kurd tasfîye bike, bi vî rengî înkara kurdan di Lozanê de hêz û cesaret daye hêzên dagirker ên kurdan ku hemû hêza xwe bi ser kurdan biçin û wan tune bikin, kurd bûn qurbanê berjewendîyên hegemonîya Cihanê, di mijar kurd de ew di pleya yekemîn de perpirsyar derbarê tiştê bi serê kurdan tê.

Sîstema Cîhanê ya sîyasî û aborî ya ku sedsala 20. Hatibû çêkirin îro têkçûye, sîstema kapîtalîzmê bixwe jî di krîzeke û buhraneke kûr de ye, bi destwerdanê li ser dewletên erebî û şerê Sûrîye, Ukarayna û şerê Xeze û Hemasê hewl tê dayîn ku sîstemeke nû sîyasî û aborî bê avkirin, dewletneteweyên ku ji alîyê hegemonîya Cîhanê ve hatibû avakirin, têkçûna wan piştrast bû, dewlet-neteweya bi ramana yek ziman, yek al yek netewe Rojihilata Navîn kir gola xwînê, piştî ev dewlet-nerewe bi kok bûn, êdî nema weke berê xizmetê benîyên xwe re dikin, dem dem li gor xwe jî tevdigerin, lewma jî Rojhilata Navîn li ber guhartinê ye.

Ji çarîyeka sedsala 20. û nexasim van salên dawî û vir de tevgera kurd pêngavên baş avêtin, Tevgera Azadîya Kurdistan guhartineke zihnî di civaka kurd pêk anî, ev guhertin û bandorkirin piştî Şoreşa Rojavayê Kurdistan, bi serhildana Jîna Emînî a bi pêşengtîya jinên Rojhilatê Kurdistanê û drûşmeya ``Jin, Jîyan, Aazdî`` ku wergerîya serhildana tevahîya jînên Îranê her wiha jinên Cîhanê berdewam kir, kurd îro fekorê guhartin û demokratîkirina dewletên herêmê ne, û ew ê vê pêşengtîya xwe berdewam bikin.

Piştî sed salî di polîtîkaya hêzên hegemonya Cîhanê de guhartinek qismî beramber gelê kurd tê dîtin, ev guhartin ji deh salên dawî sedsala 21. Dest pê kiriye, avabûna statyûya Herêma Başûrê Kurdistan, her wiha avabûna Xweserîya Demokratîk ya Bakur û Rojhilatê Sûrîye nimûneyeke jê ye ku vîtoya li ser Kurdistan hatîye şkandin, bêguman ev vîto ji ber xwe de nehat şkandin, berdêlê pir giran hatin dayîn heta ku ev guhartin pêk hat, bi deh hezan şehîd xwîna xwe li ser vê axê rijand. Piştî vê hêzên hegemonîk nikarin kurdan nedîtî bibînin, ji ber kurdan bi hêz û qurbanîyên pêşkêş kirin xwe kirin hejmarek girîng ji girêfta Rojhilata Navîn. Ji hemû deman zêdetir niha mijara kurd li ser maseya hêzên mezin e.

Hêzên herêmî dagirkerên Kurdistan her yek ji wan hatiye dorpêçkirin, rewşên xirab jîyan dikin, rejîma Sûrîyê lawaz ketîye, li ber têkçûnê ye, dewleta Tirkîyê ji encama polîtîkayên Erdokan bi krîzên sîyasî û aborî re rû bi rû ye, hewl dide xwe jê rizgar bike, lê ev zû bi zû pêk nayê ancax bi guhartineke demokratîk û çareserkirinê pirsgirêka kurd dikare vê pêk bîne, rejîma Îran bi dehê salan e di dorpêçê de ye, lêdanên Îsraîl li Sûriye û deverên din li dijî Îranê, ta astekê ew tengav kirîye, rewşa wê ji ya Tirkîyê xirabtir e, eger em bên ser Îraqê, em ê bibînin ku Îraq weke dewlet ti heybeta wê nemaye, em dizanin ku Îraq di bin wîsayeta Îranê de ye, vê demên dawî, Tirkîye jî hewl dide di rêya sunnîyên Îraq û Barzanî re li Îraq di biryara sîyasî de serwer be, niha vê gavê yek bi tenê nikare şer bike, ev her çar dewlet-neteweyên statûkparêz hêza xwe di yekîtîya xwe de dibînin, lewma jî beramber guhartinên ihtîmale pêk bê, makanîzmeyên sê qolî û çar qolî dijî kurd berdewam in, bi civînên Stana, Tahran û Enqere hewl tê dayîn pêşketin û guhartinên ku pêkane di doza kurd bêne kirin pêşî bigirin lê ev êdî dem derbas bûye, êdî nikarin ji leza tevgera kurd bi basêkên xwe yê leşkerî û sîyasî kêm bikin û kurdan tune bikin, êdî ew dem derbas bûye, û kurd ne kurdê berê ye. Bi Şoreşa Rojava re û şerê dijî DAÎŞ re mijara kurd bûye mijareke navnetewî, hêza QSD bûye, yek ji hêzên herî bi bandor di şerê li dijî DAÎŞ ku cihê xwe di nava hêza Hevpeyman ya heftî û du welatan de cihê xwe digire.

Ta niha xwendina Tevgera Azadîya Kurdistan û Hêzên Rojavayê Kurdistan ji pêşketinên li herêmê rû didin xwendineke rast bû, lewma hem dikarîn xwedî li kurdan derkevin, li Şengal, Kerkûk û Rojava ew parastin, di heman demê qaveke bi kalîte di doza kurd ber bi pêş dan avêtin piştî sed sal ji Lozanê, piştî vê vegera ber bi paş êdî zehmet e, lê divê em vê jî bêjin beşekî kurdan ku nûnertîya xwe di ENKS û mala Barzanî de dibîne xwendina wan ji pêşketinên li herêmê çêdibin re şaş bû, hemû hesabê xwe wan li ser Tirkîyê, itîlafa Sûrî ya Îxwanî ya ku dijmintîya kurdan dike bû, cihgirtina li cem dagirkerên ku rojane ciwanên kurd bi roj li kolanan didin ber gulleyan dikujin çiqas rast e! Gelê kurd êdî ne yê berê ye, zana bûye xeta xîyanet û berxwedanê ji hev derdixe. Eger kurd berjewendîyê teng û malbatî bidin alîyekî û yekîtîya netewî ji xwe re bingeh bikirin, û nebin dûvik, nekevin xefkên dijmin, kurd bi ser dikevin, tiştê ku Lozanê derbas bike yekîtî û yekrêzîya kurdan e, danîna nakokîyan li alîyekî ye, divê kurd ên her parçeyî bên cem hev, nêrînên xwe bikin yek ew li ser çi li hev dikin û ji welatê ku ew di navê de ne çi dixwazin? bila ew xalên li ser li hev dikin bibin xetên sor, ku çi dibe bila bibe nabe ew xet bêne derbas kirin, di asta giştî Kurdistanê de jî Rêber Abdullah Ocalan ji bo yekîtîya kurdan 5 perensîbên dîyar kirine: ``Kongra Netewî bê li darxistin û her çîn, beş, kesayet û partî û rêxistin cihê xwe di nava de bigirin – Desteyeke Rêbeber ya kongre hebe, ew berpirsyar e di ber xebatên partîk-polîtîk û xebatên dîpolomasî ên hundir û derve, eknomîk, civakî û çandî weke sazî bimeşîne – tevahîya hêzên xweparastin yên çar parçeyan di bin sîwaneke hevpar de dike yek - desteyeke têkîlîyên derve bê avakirin, têkîlîyê bi dewlet û civakên sivîl re çêbike``. Eger ev perensîpên Rêber Abdullah Ocalan pêşkêş kirine bingeh bêne girtin êş azarên kurdan ên sed salan çareser dibin.

Me li jor da zanîn ku guhartin di helwestên hegemonîya Cîhanê de beramber kurd çêbûye, Emerîka bi hêsanî ji Sûrîye nakêşe, mayîn li vir bi ewlekarîya xwe ya netewî ve girêdidin, mînîmzekirina Îran û parastina Îsraîlê di rojevê de, hatina serfermdara erkanê Emerîk ji herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyê re, dawîanîna nîqaşên mayîna hêzên Emerîkî di nava sazî û dezgehên Emerîk de dawî li qonaxekê anî, vê gavê pêdivîya Emerîka bi kurdan heye, kurd fektorê guhartinê ne, Şoreşa Rojava û dest danîna ser herêman, dê dewleta Sûrîye neçar bike ku guhartin pêk bîne, neçare dewlet di majara nenavendîbûnê gav bavêje, her wisa ji bo Tirkîyê jî, çareserkirina pirsgirêka kurd li Tirkîyê û pejirandina xweserîya demokratîk li Bakurê Kurdistanê dikare Tirkîye ji wê krîzê derbixe ne tiştekî din, heta xwînrijandina hundir neyê rawestandin Tirkîye ne pêkane bi ser xwe ve were, lêçûnên van operasyonên Tirkîyê li dijî kurdan li dar dixe aborîya Tirkîye anîye ber sifrê. Bi vê mijarê ve girêdayî birêz Ocalan di noteke hevdîtinê sala 2009’an gotibû: ``Mustefa Kemal bi derketina ji Amasyayê giştînameye weşand têde got ku kurd û Tirk têkoşîneke hev dimeşînin, dewleta were avakirin jî wê dewleta herdu gelan be. Di makezegona 1921 de hin biryar –zagonên ku qebûl dikin xweserî bide gelen hatin bi cikirin. Rêber Abdullah Ocalan dide dîyar kirin ku ``Lozana civakî çêbibe wê pirsgirêk çareser bibin`` komara heyî kêm maye, ev komar bê demorkratîkirin, komar yek alî maye, Lozana ku hatibû çêkirin Lozana lihevkirina dewletan bû, civak têde nîne, Peymana Lozanê xwîşk û biratîya gelan ji holê rakiriye, netewe kirin dijminê hev, divê ev ji nû de bê sererastkirin. Îran ketîye ferqa wê yekê ku ew armanc e, hewl da bi daxuyanîya Mesûd Bizîşkîyan derbarê kurdan, kurdan ber bi xwe bikêşîne. Kurd weke sedsala 20. Weke berê jîyan nakin, kurdan ew qonax li paş xwe hiştin. Bi şerê DAÎŞ û avakirina Şoreşa Rojavayên Kuristanê kurdan mohra xwe li sedsala 21. Daye, lewma jî kurd avakirina Rojhilata Navîn ya nû de hene, û dê maf û statyûya xwe bistînin, kes nikare li pêşîyê bibe asteng, kurd bernamzetên ku pêşengtîyê di asta Rojhilata Navîn de bikin, felsefeya netewa demokratîk îro bûye realîteyek li Bakur û Rojhilata Sûrîye, ev altirnafê dewlet-neteweya li ber têkçûnê ye.

**NAVENDA ROJAVA YA LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK (NRLS)**

# ‘Hişmendiya DAIŞ‘ê Rûyê Rast ê Dewleta Tirk e’

Di dîroka 27‘ê Tirmeha 2016‘an li taxa Xerbî ya Qamişlo teqînek mezin rû da. Di encama wê teqînê de gelek welatî şehîd û birîndar bûn. Tevî ku çeteyên DAIŞ’ê berpirsyariya teqînê girt ser milê xwe jî, lê li paş bûyerê gelek hêzên hegemonîk û di serî de dewleta Tirk a dagirker, bû.

**Argêş Gewda/Qamişlo**

Bi hatina salvegera teqîna taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo, hevserokê Encûmena Cîbîcîkar ya Rêveberîya Xweser yê Kantona Cizîrê Talet Yûnis bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wisa bû:

**1- 27‘ê Tirmeha 2016‘an çeteyên DAIŞ‘ê li Taxa Xerbî ya bajarê Qamişlo teqîneke mezin a hovane pêk anîn, armanca wê teqînê çi bû?**

Di navbera salên 2014 û 2015‘an de çeteyên DAIŞ‘ê li hemberî berxwedanîya YPG û YPJ‘ê ne karî berxwe bide û têk çû. Bandora xwe seranserî giştî şoreşa Rojava kir. Ti hêza nêkarîbû bi rêya şerên çekdarî li hemberî keç û xortên Kurd berxwe bidin. Ji ber wê ye gelek komên çete bi rûyên cuda hewldan kirin ku vê hevgirtin û asayîbûna herêmê bidin xerab kirin. Li Pirsûs û Amedê heman demê li Şêranê çawa wan komên çete êrîşên hovane pêk anîn, hewldan piştî rizgarkirina Kobanê jî heremê tevlêhev bikin. Li wan êrîşan yek jî êrîşa dîroka 27‘ê Tirmeha 2016‘an li Qamişlo taxa Xerbî bi destê çeteyên DAIŞ‘ê êrîşeke terorî hat pêk anîn. Gelek welatî û şervanên YPG û YPJ‘ê di encama vê teqîna hovane de gehiştin asta şahadetê, gelek kes jî birîndar bûn. Ev êrîş encama sîyaseta dewleta Tirk ya dagirker ya li ser herêmê bû. Armanca wê êrîşê tekbirina ewlehiya




herêmê û qirkirina gelê Kurd û gelên herêmê bû.

**2- Di roja me ya îro de gef û êrîşên dewleta Tirk a dagirker û bi wê girêdayî yên çeteyên DAIŞ‘ê li ser herêmê berdewame, bêdengîyek di asta herêmî û cîhanî de li hemberî wan êrîşan heye, sedema vê bêdengîyê çi ye?**

Dewleta Tirk ya dagirker gelek caran hewildan kir ku bi şêwazên hovane yên cûda êrîşan li ser herêmê pêk bîne. Bi destên komên çete yên wek El Nûsra û DAIŞ‘ê hewil da qirkirinê li ser gelê Kurd bide meşandin. Piştî têkçûyina DAIŞ‘ê êrîşên dewleta Tirk ya dagirker li ser herêmê kêm nebû. Bajarên weke Efrîn û Serêkaniyê jî hatin dagirkirin. Bi teknîka destê xwe de giştî dan şuxulandin ku ji bona bikarin bajarên Rojavayê Kurdistanê ku ji DAIŞ’ê hatin rizgarkirin, dagir bikin. Gelek caran êrîş li ser Herêmên Parastina Medya jî kirin. Pir çeteyên DAIŞ‘ê yên ku Rojava kiryarên terorî de cih girtibûn, tevlî komên çete yên bi navê Arteşa Azad yên girêdayî dewleta Tirk ya dagirker bûn. Heya dîroka îro jî dewleta Tirk ya dagirker hewl dide feraseta DAIŞ‘ê li herêmê zindî bike. Hemû hêzên garantor yê ku li axa Bakûr û Rojhilatê Sûriyê dimînin weke Rûsya, DYA û komên girêdayî dewleta Îranê hîn piştgrî didin êrîşên dewleta Tirk ya dagirker û bêdeng dimînin. Sedema wan bêdengîyê jî ji ber ku dema mijar dibe gelê Kurd çi kes çi gotinan nayene ser ziman. Yên ku jibona Filistînê radibin meşan amade dikin, mijar qirkirina gelê Kurd dibe giştî ker û lal dibin. Sîyaseta ku herêmên dimeşinîn berjewendîyên gel naparêze, armanca wan tenê berjewendîyên wan yên sîyasî û desthilatî ne, ji ber vê ye bêdeng dimînin.

**3- Ji bona xeteriya DAIŞ‘ê di milê hişmendî , hem jî di milê leşkerî de bi dawî bibe, pêwîste li ser asta Bakur û Rojhilatê Surîyê çi were kirin?**

Wek tê zanîn çeteyên DAIŞ‘ê di alîyê leşkerî de têk çûye. Serwerîya wê ya herêmê di aliyê şerwanên Kurd wê hate têk birin. Lê hîna jî xeterîya DAIŞ‘ê li herêmê bi dawî nebûye. Li hemberî xeterîya çeteyên DAIŞ‘ê li herêmê hem aliyê leşkerî û hem jî yê hişmendî tekoşînek pir giran û bûha hat meşandin. Ev şaneyên veşartî yên ku di alîyê dewleta Tirk ya dagirker ve tên rêvebirin hema her roj ji aliyê QSD’ê ve li dijî wan operasyonên taybet tên kirin. Di asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê de di her milê de tekoşîn tê meşandin. Ji bona civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê bikare xwe rêxistin bike û bi xwe xwe rêve bibe şerê gelê şoreşgerî tê amade kirin. Hemberî ferasetên DAIŞ‘ê yê ku hatiye ferz kirin li ser gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê hewildanek mezin tê kirin ku ji bona ev tirs û xofa di nava gel de hatiye avakirin, bê rakirin. Ji bona ewlekarîya hundirin jî hem hêzê Asayîşê û hem jî hêzên QSD‘ê kar û xebatek mezin pêş dixin û pir encamên girîng jî hatine girtin. Ji ber ku êdî ne çeteyên DAIŞ‘ê, ne jî çi hêzên din bikarin aramî ya li ser herêmê xêra bikin. Di alîyekê din jî hem girtîgehên ku çeteyên DAIŞ‘ê û kampa Holê ku malbatên çeteyan lê dimînin metirsiyek mezin jî li ser herêmê dide avakirin. Pêwîste ji bona ev xeterîya DAIŞ‘ê ser herêmê dawî bibe, çeteyên DAIŞê ku hatine girtin, bên dadgehkirin û encam bê girtin. Pêwîste ji bona wê jî dadgehek navnetewî bê avakirin. Her wiha jî pêwîste xebatên ewlehî û xwe rêxistinkirinê jî bê pêş xistin. Xebatên perwerdeyî jî dibe bên zêde kirin, jibona zarok û ciwanên herêmê rastîya xwe nasbike, her êrîşê ku beranberî axa wan tê kirin bikarin bi vîna azad berxwe bidin. Pêwîste fedekarî û pakrewantîya zarokên wê gelê bê dîtin û qet neyê jibîrkirin.

# ‘Komên çete ji asta vagnerê derbas bûne’

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Endamê Navenda Rojava a Lêkolînan Rakan Şêxê da zanîn ku komên çete yên muxalefetê ji asta vagnerê zêdetir di destê dewleta Tirk de tên bikaranîn û xwe beşek ji artêşa Tirk dibînin. Her wiha Şêxê anî ser ziman ku armanca dagirkeriya Tirk ew e ku pirojeya Netewa Demokratîk têk bibe û Mîsaqa Milî a dagirkirinê di herêmê de bi cih bike.**

Dewleta Tirk şerekî dagirkeriyê li ser Qadên Berxwedanê û axa Başûrê Kurdistanê dide meşandin her wiha bi dehan ji komên çete yên girêdayî muxalefeta Sûriyê li hemberî Gerîla dide bi kar anîn. Têkildarî mijarê endamê Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS), Rakan Şêxê bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Dewleta Tirk komên çete yên weke Hemzat, artêşa Niştîmanî û hwd di şerê Lîbiya, Ezerbîcan û Nîcer de weke amûrekê bi kar anî û herî dawî jî li hember Gerîla bikar tîne, hûn vê yekê çawe dinirxînin?**

Dewleta Tirk a dagirker dewleteke nû ye piştî impratoriya Osmanî li ser destê Ataturk di sala 1923’an de hatiye avakirin. Bi dirêjahiya avabûna dewleta Tirk a dagirker heta roja îro gelek tevlîhevî di herêmê de afrandiye. Da ku hebûna xwe bidomîne û hertim netewek li dijî neteweke din bi kar aniye. Eger em dîroka dewleta Tirk binêrin, dê bibînin ku bi sedema wê şer û nearamî li herêmê berdewam e. Sedem ji vê yekê pêkanîna xewin, xwestek û plana impiratoriya Osmanî ye, dewleta Tirk dixwaze Mîsaqa Milî a dagirkirina herêmê pêk bîne. Bi destpêkirina kirîza Sûriyê jî dewleta Tirk riyek ji pêkanîna berjewndiyên xwe re dît ku destwerdanê di vê aloziyê de bike û xaka Sûriyê dagir bike. Ji ber wê jî hembêza xwe ji DAIŞ’ê, Artêşa Azad û hemû komên çete yên radîkal re vekir. Êdî ew komên çete li hember gelên Sûriyê bi kar anîn û bi destên van çeteyan gelek dever weke Efrîn, Serêkaniyê, Girê Spî Ezaz û hwd… dagir kir. Piştî wê jî dewleta Tirk da ku ecindatê xwe li Efrîqiya çêbike ev komên çete li Lîbiyayê bi kar anîn. Di heman demê de ji bo Ezerbîcanê û Nîcer jî hatin şandin û bi destên van çeteyan dagirkeriya Tirk şerê xwe berdewam kir. Niha jî Tirkiye bi sedan ji wan çeteyan di şerê li dijî Gerîla de bi kar tîne. Ev komên çete asta vagnera cîhanî derbaskirine, ji ber ku netenê ji bo mesleyên abûrî şer dikin. Ew xwe weke beşek ji artêşa Tirk dihesibînin û mijara niştîmanî ji bo wan ne girîng e.

**Wekî tê zanîn ku dewleta Tirk bi hevkariya PDK’ê gelek çeteyên DAIŞ’ê ji Îraqê ber bi çiyayên Kurdistanê ji bo şerê li dijî Gerîla bir, hem jî îro komên çete yên girêdayî muxalefetê bikar tîne û dixwaze Başûrê Kurdistanê dagir bike. Gelo ev yek ne pêkanîneke ji Mîsaqa Milî re ye? Lê çime kes li hemberî dagirkeriya tirk û siyaseta wê ya qirêj û gemar dengê xwe nake?**

Di roja îro de lihevkirinek di navbera Îraq, Îran û dewletên Ereban de têkildarî hin mijarên aborî bi dewleta Tirk a dagirker re hene. Berî demekê nûnerên dewleta Tirk, Îmarat û Qeter li hev civiyan û di vê civînê de lihevkirinek di navbera wan de çêbû ku riyeke aborî ya istratîjîk vekin û parzemîna Asiya bi ya Ewropayê ve girêdin. Ji xwe jî daxwaza dewleta Tirk ew e ku xwe bighîne Bendera FAW a ku dikeve başûrê Îraqê û riya aborî a bi navê Riya Geşedanê veke. Di heman demê de dewleta Tirk bi van daxwazên aborî re pilaneke dagirkeriyê dide meşandin. Serdana Erdogan ji Hewlêr û Bexdê re ji bo planên dagirkirina axa Başûr û Îraqê û pêkanîna Mîsaqa Milî bû. Niha jî em dibînin ku dewleta Tirk bi rengekî hovane êrişî Gerîla dike û axa Başûrê Kurdistanê dagir dike, armanc jê têkbirina Gerîla û tunekirina gelê kurd e.

**-Dewleta Tirk li herêmê, hem li Sûriyê, li Îraqê, Lîbiya, Ezerbîcanê komên çete û DAIŞ’ê bikar tîne û wekî em dibînin liv, tevger û êrişên DAIŞ’ê pir bûne, di heman demê de li deverên dagirkirî weke Efrîn, Girê Spî û Serêkaniyê her û her binpêkirin didomin, çima hêzên navdewletî li hember van kiriyarên terorî bêdeng dimînin?**

Dewleta Tirk li ber çavên Netewên Yekbûyî û cîhanê bi tevahî komên çete



yên radîkal li xwe komkirin. Herwiha navendên perwerdekirinê ji bo van komên cîhadîst vekirin, piştre jî ew çete bo şerê Lîbiya, Ezerbîcan û hwd ama de kirin. Berî çend rojan jî dewleta Tirk bi awayekî pilankirî zindana Meerîn ya Ezazê ku çeteyên DAIŞ’ê dihewîne nava xwe, vekir. Armanc ji vekirina vê zindanê ew bû ku van çeteyên DAIŞ’ê jî bişîne herêmên Parastina Medya û li hemberî Gerîla bi kar bîne. Sedema sereke ji bêdengiya dewletên hegemonî ji bo kiriyarên dewleta Tirk û sûcên ku komên çete li herêmê pêk tînin berjewendiyên hevbeş yên dewletên desthilatdar e. Em dibînin ku rojane li Efrîn, Serêkaniyê û herêmên dagirkirî kuştina gel, topbaran heye. Di heman demê de jî şêneyên resen tên dîlgirtin û darên herêmê tên birrîn. Hemû tevlîheviya ku li Rojhilata Navîn çêdibin, dikevin xizmeta hêzên kapîtalîst û hegemon yên rojavayî. Ji xwe armanca wan hêzên desthilatdar jî destwerdanana di herêmê de ye, da ku ev yek jî pêk were divê şer û tevlîhevî di herêmê de çêbibe. Dewleta Tirk jî daxwaza hêzên hegemon pêk tîne û hertim li ser hesabê xîna gelan tevlîheviyê û şeran çêdike.



## Têkiliya bi dewletan re: Dîplomasi û xiyanet

**Ahmet Aktaş**

Di cîhanê de gelek şêwazên têkilî û peywendiyan hene, di navbera kesan, netewan, dewletan û hwd. de Belê di vê gotarê de mijar, bi taybetî li ser rêxistin û partiyên me yên bi dewletan re ye.
Bi giranî li ser du şêwazên têkiliyên li gel dewletan axaftin û şîrove tên kirin: Dîplomasî û nokerî(xiyanet). Hema yekser em derbasî mijarê bibin; li Kurdistanê rêxistinên pêşengiya vê mijara peywendiyan dikin PDK, YNK û PKK ne. Ji vanan jî yên pir axafin; rexne û pesindarî li ser tên kirin PDK û PKK ne. Ka em bi kurtayî bala xwe bidin rewşa têkilî û peywendiyên van partiyan. Têkiliyên van partiyan teva, bi gelek dewletan re hene, belê bi taybetî divê em bala xwe bidin peywendiyên wan ên bi dewletên dagirker re çawa ne?
PDKê bi Îranê re têkilî danîn, bi wê re êrîşî partiyên Rojhilat kir, ji her du aliyan bi sedan pêşmerge hatin kuştin û ji her alî ve gelê Rojhilat xistin nava aloziyek mezin.
PDKê bi Iraqê re êrîşî hêzên YNKê kir(hema di êrîşa hevbeş a dawî de ya 1996an a Hewlêrê tinê), gelek pêşmerge hatin kuştin û şehîd kirin, Hîro Xan a hevjîna Mam Celal jî dîl hat girtin û nêzî 100 endamên PKKê yên li nexweşxaneya Hewlêrê jî hatin şehîd kirin.
Niha jî, bi dewleta tirk a dagirker û faşîst re, êrîşên hevbeş ên qirker dibin ser endam û alîgirên PKKê û her wiha êrîşê dibe ser Rêveberiya Xweser û hemû destkeftiyên şoreşa gelê me yê Rojava! Têkiliyên PKKê jî, bi van dewletan re heye, ma gelo kes dikare mînakekê nîşan bide ku bi hêzên van dewletan re êrîşên hevbeş birine ser filan partiyê an gelê mê yê filan parçeyî?
Îca, ka gelo mirov têkiliyên PDKê û yên PKKê yên li gel van dewletan, dikare weke hev bibîne?
Jixwe ya mirova hêrs dike jî, hilwesta hinek kesên xwe rewşenbîr û siyasetmedar dibînin, di çapemeniya Berzaniyan de, têkiliyên her du partiyan dike weke hev û dibêjin, “ma çima têkilî ji PKKê re asayî ye û Mezlûm Ebdî jî dixwaze têkiliyan bi dewleta tirk re deyne, ji vanan re normale lê ji Berzaniyan re ne asayî ye û xiyanet e”? Eha li vira têkiliyên dîplomatî û yên xulamtî derdikevin holê. Têkiliyên PKKê, li ser berjewendên gelê Kurdistanê ye; têkoşîna ji bo bidestxistina gav û qonaxên siyasî ye, an bi gotina latînî karê diplomasî ye. Her wiha ne li dijî karê partiyek din e. Lê têkiliyên PDK a Berzaniyan, li ser berjewendên hinek kesan(Mesûd, kur, biraza û çend kesên din) e, berjewendiya partiyê jî nîne. Bêgûman dewletên vê berjewendiyê pêşkêşî wan dikin jî, ji bo berjewendên dewleta xwe ne. Ev jî ne diplomasî ye, ev xwefiroşî-kurdfiroşî ye, an bi gotina tê zanîn xiyanet e.
Hema bala xwe bidin têkoşîna Rêber APO, ev ferq û cudahî zelal xuya dibe. 25 sal e di zîndanê de jî, li himberî xiyanetê berxwedan pejirandiye û karê xwe yê bîrdozî û dîplomasî di asta herî hêja de dimeşîne û neyarên Kurdistanê ditirsîne!



# ‘Çareserî danûstendinên sûrî-sûrî ye’

Lihevkirina ku li ser hesabê rijandina xwîna gel û talankirina xaka Sûriyê pêk bê, wê tu carî xizmeta aramî û çareseriyê neke. Cîgirê Rêveberiya Xweser li Kantona Efrîn û Şehbayê Cemal Reşîd destnîşan kir ku çareserkirina aloziya Sûriyê tenê bi diyaloga Sûrî-Sûrî pêkan e.

**Zana Roj/ Şehba**

Faşîzma Tirkiyê di çarçoveya parastina berjewendiyên xwe yên ku di aloziya Sûriyê de û li ser hesabê xwîna gelan bidest xistine; banga lihevkirineke pişt 13 salan ji şer û dijminahî bi Esed re dike. Ev lihevkirin her çiqasî ji aliyê her du dewletan ve pêk werin jî, wê bi tu awayî xizmeta gelên Sûriyê neke û tu çareseriyê bi xwe re neyne. Sûriyê bi jiyankirina zêdetirî 12 salan ji şer, pevçûn, talankirin û perçekirina xaka Sûriyê, di wê baweriyê de ye ku Sûriyê careke din weke berê venagera. Tavahî hêzên ku xwe di Sûriyê de birêxistin kirine û destwerdan kirine ji bilî parastina berjewendiyên xwe û perçekirina Sûriyê tiştek din nekirin. Di vê aloziyê de tenê pirojeya Netewa Demokratîk hemû gel û pêkhateyên di Sûriyê de di nava xwe de hewand û li ser xeta azadî, demokrasiya gelan û avakirina Rêveberiyeke ne navendî gel di herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de xwe birêxistin dike.
Têkildarî nêzîkatiyên di navber Tirkiyê û Sûriyê de, cîgirê Rêveberiya Xweser li Kantona Efrîn û Şehbayê Cemal Reşîd ji rojnameya me re peyivî.



**Tirkiyê û jiyankirina hewildanên binketî**

Cemal di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Divê em ji bîr nekin ku nêzîkatiyên di navber Tirkiyê û Sûriyê de pir kevi in. Lê ev yek di asta têkiliyên istixbartî û tlkiliyên veşartî de bûn. Lê her dem yê ku temenê vê yekê daye, gelê Sûriyê ye, bi taybet gelê Kurd e. Dema mijar dibû gelê Kurd hemû hêz û alî ji bo qirkirina gelê Kurd dibûn yek. Ji lewra têkiliyên di navbera her du dewletan de bi awayekî temamî nehatibû qut kirin. Di encama valaderketina pilanên Erdogan ya vegerandina serweriya Osmaniyan ya ku ji Sûriye de wê destpê bike û berfirehtir bibe, her çiqas pêlan pêş xistin lê hemû jî vala hatin derxistin. Bi taybet li Başûrê Kurdistanê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê, tu encam bi dest nexistin. Ev yek jî ji ber berxwedanî û yekbûna gelan li ser bingeha paradîgmeya Netewa Demokratîk û serkeftiyên ku hatine bidestxistin, faşîzma Tirkiyê rûxmî hemû êrîş, avakirina DAÎŞ ê û pilanên siyasî li hemberî têkbirina vê yekê bi ser neket.”

**‘Nimêjkirina li Mizgefta Ûmewî vegeriya pilanên lihevkirinê’**

Cemal anî ziman ku bi jiyankirina binkeftinan re faşîzma Tirkiyê berê xwe da rêbazên din û wiha pê de çû: “Tirkiyê her dem çeteyan him di hundir Sûriyê û him jî derveyî Sûriyê weke çete bikar anî, ji lewra me got ku têkiliyên wan yên veşartî tu carî qut nebûn. Dema Tirkiyê di siyaset û pilanên xwe yên demdirêj di Sûriyê de bi ser neket, niha dixweze li ser xala vegerandina têkiliyan bi Sûriyê re kar dike, da ku li ser hesabê gelê Sûriyê berjewendiyên xwe biparêze. Di van lihevkirinan de divê gelê Sûriyê ji vê yekê agahdar be ku wê tu sûdê û xizmetê ji wan re peyda neke. Erdoganê ku digot “Ez ê Sûriyê dagir bikim û li Şamê li Mizgefta Ûmewî nimêj bikin” ev armanc neguherî têkiliyên lihevkirinê.”

**Parastina têkiliyên bi Rûsiye û Îranê re**

Cemal wiha dewam kir: “Têkiliyên Faşîzma Tirkiyê di vê demê de ne ji valatiyê hatiye. Li milekî ji bo razîkirina Rûsya û Îranê ye, li milê din jî ji bo nêzîkbûna bi Sûriyê re ye. Lê berjewendiyên Tirkiyê ne tenê di Sûriyê de ne, her wiha rolekî mezin di Başûrê Kurdistanê de jî dilîze. Ji lewra naxwaze têkiliyên xwe bi Îranê re qut bike û dixwaze careke din têkiliyên xwe bi Sûriyê re ava bike.” Cemal diyar kir ku di van lihervkirinan de zelalkirinek nehatiye avakirin û wiha domand: “Hêj tam siyaseta ku di van lihevkirinan de tê gerandin nehatiye zelal kirin. Ji ber hin dosiyeyên Sûriyê hene divê bêne çaresekirin. Weke ku hatiye xuyakirin hikumeta Şamê di helwesta xwe de diyar kiriye ku divê Tirkiyê ji tavahî xaka Sûriyê bê vekişe. Lê di vir de zayîfbûna Hikumeta Sûriyê jî heye, ger zextek ji aliyê Rûsya de li ser Hikumeta Şamê bê kirin dibe ku Hikumeta Şamê ji helwesta xwe ya li hemberî Tirkiyê vegere.”

**‘Çareserî; Pirojeya Netewa Demokratîk û diyaloga Sûrî-Sûrî ye’**

Cîgirê Rêveberiya Xweser li Kantona Efrîn û Şehbayê Cemal Reşîd anî ziman ku lihevkirin nakevin xizmeta Sûriyê û pêwîstî bi qebûlkirina diyalogê di hundir Sûriyê de heye û wiha axaftina xwe bi dawî kir: “Bi derbasbêna ewqas sal li ser aloziya ku ji bilî talankirin û koçberkirina gelê Sûriyê bi xwe re neaniye, êdî pêwîstî bi çareseriyeke navxweyî di hundir Sûriyê de heye. Hikumeta Şamê divê derî ji diyaloga bi aliyên di hundir Sûriyê de veke. Erdogan ji bilî perçekirin û dagirkirina Sûriyê tiştekî din ji Esed qezenç nekir. Divê Esed berê xwe bide hêzên welatparêz yên ku her wext banga têkilî, danûstendinan dikin.
Ji xwe hêza ku ji têkilî û danûstandina bi Sûriyê re vekiriye ji xwe ber çavaye; Pirojeya biratiya gelan di hundir Sûriyê de mînak û modêla herî serkeftî di hundir Sûriyê de ye. Hemû pêkhate tê de cihê xwe girtine û deriyên xwe yên siyasî û dîplomasî ji alî re vekiriye. Hêviya me ku Esed careke din lêvegerîneke çêbike û danûstandinên xwe bi HSD, MSD û Rêveberiya Xweser di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de avabike. Modêla herî serkeftî di Sûriyê de Pirojeya Netewa Demokratîk e û çareseriya aloziya Sûriyê jî bi diyaloga Sûrî- Sûrî ye.”

# Xwedîderketina li penaberên sûrî erkekî mirovî ye

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Hevserokê Ofîsa Karên Penaberan a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk Şêxmûs Ehmed diyar kir ku pêwîst e Netewên Yekbûyî bibe xwedî nêrîn û destekê bide penaberan, ji ber ku ev erk ne tenê erkê Rêvberiya Xwesere, lê erkekê mirovî ye.**

Bi dirêjkirina kirîza ku negihîştiye tu encaman, gelê Sûriyê mecbûr ma berê xwe bide welatên derve. Yek ji dewletên ku deriyê xwe ji penaberan re vekir Tirkiyê bû. Hejmara herî zêde yên penaberan derbasî tirkiyê bû. Bê guman ev yek ne tiştekî ji rêzê bû. Faşîzma Tirkiyê li ser van penaberan hesab û pilanên gelek qirêj dida meşandin. Di van demên dawiyê de ji aliyê hin dewletên weke Lubnan, Îraq û bi serkêşiya faşîzma Tirkiyê biryara derxistina bi darê zorê ya penaberên Sûriyê hatiye standin. Di derbarê vê mijarê de Hevserokê Ofîsa Karên Penaberan a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Şêxmûs Ehmed ji Rojnameya me re axivî.
Şêxmûs Ehmed diyar kir ku rewşa penaberên ku li dewletên mîna Turkiyê û Libnanê gelek astengiyan dikşînin û wiha got: “Her ku diçe rewşa penaberan ber bi xeteriyê ve diçê, piraniya gelê sûrî ji destpêka aloziyê ve heye roja îro gelek penaber û koçber çêbûn, tê zanîn ku êrişên dewleta Tirk a dagirker li ser herêma Bakur û Rojhilatê Suriyê bû sedem ku di asteke gelek mezin de gel ji axa xwe derkeve û koçî welatê derve bibe, her wiha li herêmên ku Kurd lê dijiyan û ji milê dagirkeriya tirk ve hatine dagirkirin, malbatên çeteyan hatine bi cih kirin û rojane guhertina demugrafîk tê çêkirin. Dikarim bêjim ku dewleta Tirk siyaseta Tirkirinê dide meşandin û dixwaze hemû heremên ku dagirkirine tevlî axa tirkiyê bike. Di heman demê de li ser van koçberan bazar tê kirin û ti mafekî rewa ji wan re nayê dayîn, penaberên sûrî rastî tundiyekî gelek mezin tên û mînakên vê jî beriya demekê li Libnanê jî hate dîtin, hem dewlet û hem jî civaka Libnanê gelek caran nerazîbûnên xwe ji bo penaberên sûrî tînine ser ziman.
Her wiha Rêvberiya Xweser jî di vê derbarê de hin daxwîyanî dan, bêguman li tirkiyê jî heman rewş li hemberî penaberên Sûrî tê jiyan kirin. Her wiha beriya demekê çi markêtên gelê surî hebe, hemû dan şewitandin, û dewletên desthilatdar û dagirker gelê sûrê ji bo berjewendiyên xwe yên siyasî bi kar tînin.”

**‘Sûcekê dijî mirovahiyê tê dîtin’**

Şêxmûs di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Insyatîfa Sûrî ji bo penaberan hin gavên di cih de avêtin, di rastiya xwe de ev gav wekî çareseriyekê bingehîn mirov dikare lê binêre. Di heman demê de îraq biryarek bi vî awayî daye ku penaberên Sûrê derbeder bike û kampên heyî vale bike. Rêveberiya Xweser di vê mijarê de xwedî îda ye û hembêza xwe ji bo hemû kesên ku derbasî herêma wê bibe vekirî ye. Tê dîtin ku dewleta tirk a dagirker bi dijwarî êrişên xwe li ser axa Bakur û Rojhilatê Suriyê didomîne, rojane binesaziya herêmê dike navenda êrişên xwe yên ne exlaqî û sûcên dij mirovî. Di van rojên dawiyê de, geşedan û bûyerên ku di nava Tirkiyê de rûdan di rastiyê de rengê nijadî bi dijwarî xwe da nîşandan. Ji lewra Rêvberiya Xweser di vê derbarê de fikir û pêşniyazên xwe gotin, yanî çi kesê ku dixwaze careke din derbasî herêm û mala xwe bibe wê rêveberiya xweser bi wan re alîkar be. Ji bo pêşwazîkirinê jî du beşên wê hene Beşek jê welatiyên herêmê ne û beşa din jî, Rêvberiya xweser diyar dike ku pêwîst e Netewên Yekbûyî bibe xwedî nêrîn û destek, ji ber ku ev erk ne tenê erkê Rêvberiya Xwesere.”



**‘Ji bilî Rêvberiya Xweser ti alî daxwiyanî neda ye’**

Şêxmûs di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku ew dikarin di astekê de kampan ji bo penaberan avabikin û wiha domand: “Netewên Yekbûyî di vî alî de ji bo mezinkirina kampan ru gav neavêtine. Ji lewra pêwîst e erka xwe paşguh nekin û li gorî sozên xwe tev bigerin. Di derbarê van binpêkirinên ku li ser penaberan têne kirin ji bilî Rêvberiya Xweser ti alîyan daxwiyanî neda ye. Dewleta Tirk penaberan ji bo xwe dide bikaranîn û di astekê de li ser wan siyaseta birçîbûnê dide meşandin.”